

Nevî tola kalikên xwe hiltînin Govenda azadî û êgir didome

Tertele anga komkuji ji bo gelê kurd ne tiştêkî awarte ye. Li xaka Welatê Rojê qêrîn û hawaran her olan daye. Wekî diyar e, roja 29'ê pûşpera 1925'an salvegera dardekirina Şêx Seîd û hevalên wî ye. Şêx Seîd li ber sêdarê gotibû: "Ji çar milyonî bêhtir kurd wê heyfa min hilînin." Di ser vê bûyerê re 70 sal derbas bûn. Roja 30'ê pûşpera 1996'an şervana ARGK'ê Zîlanê (Zeynep Kınacı) li navenda Dêrsimê, li ser yekîneyeke leşkerên tirk çalakiyê fedayî pêk anî. Li hev gihîştina salvegera van her du bûyeran îroniya dîrokê bû. Dîsa qehremanî ji her li dar e. Li diji van terteleyan neviyên Zeradest û Şêx Seîd xwe bi êgir dişon. Sema'yên Welatê Rojê niha têr nîgar û xeml in. Şêx Seîd, Zîlan, Mazlûm, Zekiye, Rahşan, Bêrîvan, Ronahî û Sema niha govenda azadiyê digerin. Keça asîman û keskesorê Sema, banga rizgariyê kir û got: "Keştiya Nûh radibe, yên ku jê bimînin dê li bahoz û bagerê biqelibin." (Rûpel 8-9)



Êrîşên li ser saziyên demokratîk gur bûn

**Dinya çareseriyê
dixwaze,
dewlet bombe dike**

Rûpel 3

Lêkolîn: Dûrok, bêjeya kurd û wêjeya kurdî (1) - Rûpel 4

Wêje: Destana Yûsiv û Zuleyxa - Rûpel 10

Pexşan: Li wir, li welatê min - Rûpel 6

Jiyan Civak: Li bajarê Wanê berikçêkirin - Rûpel 16


Nejdet Buldan: Kurd û Îtalya Rûpel 5

Serkan Brûsk: Ecevîtê bavkurd Rûpel 7

Lerzan Jandî: Lec û ciniyî Rûpel 11

Medenî Ferho: Cîhana kor kerende Rûpel 13

Azadiya WELAT



SAMİ TAN

Niha konferansekê navneteweyî ji bo çareserkirina kêşeya kurdî di rojevê de ye. Lê rejîm dixwaze bi xûgî û bertilan rê li ber navneteweyîbûna kêşeyê bigire.

Dîmena sosret û binbariya me

Van rojan di nav rayedarên dewleta tirk de tiştên sosret rû didin. Li aliyekî li meclîsa mezin a tirkan baweriya bi Wezîrê Dewletê Eyüp Aşık ji ber têkiliyên wî yên bi kujerê kontra Yeşil re tê pirsîyarkirin. Li aliyê din wêneyên Serokwezîrê Tirkiyeyê Mesut Yılmaz digel handêrê êrîşa li ser Serokê Komeleyê Mafên Mirovan Akın Birdal, Semih Gönültay re derdikevin.

Hikûmeta MGK'ê hê jî dide fortan ji ber ku wan êrîşkar di demeke kurt de girtine, lê tevî ku demeke dirêj di ser bûyerê re derbas bûye jî, dewleta tirk nikare Yeşil bigire yan jî nagire. Di vê navê de wekî her car derdora Aydınlikê rola xwe list û bû platforma daxuyaniyên Yeşil. Di vê rojnameyê de Yeşil dide zanîn ku ew fermanberê dewletê ye, heke dewlet bixwaze dikare di cih de wî bigire jî, bikuje jî.

Digel hemû fortên hikûmetê êrîşên li ser derdorên demokratik didomin; rojname tîn bombekirin, mirovên rewşenbîr tîn girtin, îşkence û êrîşên kontrayî didomin. Bûyerên hefteyekê bes

in ji bo naskirina rûyê rastîn ê dewletê. Roja şemiyê nûnergeha rojnameya Ülkede Gündemê ya Êlihê hate bombekirin, ji saziyên "rojnamegeran", (Meclîsa Rojnamegeran ne tê de) tu deng derneket. Di ser de jî Çemiyeta Rojnamegerên Tirkiyeyê (TGC) cihê xwe ji berpîrsên rojnameyê re venekir da ku ew civîneke çapemeniyê li vir li dar bixin. Piştî vê bûyerê roja sêşemiyê îcar Serokê HADEP'a Enqereyê Kemal Bülbül hate binçavkirin û roja din jî hate girtin. Seroka NÇM'ê Nuray Şen ji aliyê polîsan ve hate binçavkirin, piştî ku li DGM'yê îfadeya wê hate girtin, hate berdan. Roja 24'yê pûşperê îcar hêzên dewletê avêtin ser HADEP'a Bağcılarê û hemû kesên di hundir de girtin binçav.

Dîmena ku derdikeve holê gelekî balkêş e. Hemû piştevanên rejîmê lihevkerî ne; kontra bombe dikin, rayedarên dewletê kirinên wan han didin, ji bo girtina wan tiştêkî nakin, polîs kesên ku bûyeran protesto dikin, digirin binçav. Saziyên pişeyî cih nadin saziyên dijber ku civînên xwe li dar

bixin û çapemeniya fermî jî bi tu awayî cih nade bûyerên tîkildarî hêzên azadixwaz.

Tiştê ku ji vê dîmenê derdikeve holê, berdewambûna polîtîkayên xeniqandina tevgera azadixwaz e. Ji bo di avê de birina van hewlan pêdivî bi geşkirina xebatê heye. Pêwîstî bi pêkanîna bereyêke berfireh heye.

Dema çalakiyên bi deh hezaran li dar bikevin, çapemeniya fermî jî, rayedarên dewletê jî nikarin çavên xwe ji wan re bigirin. Bi tenê divê mirov xwe hînî van êrîşên hovane û çeteyan neke. Divê destê me tim di berstûka çeteyan de be.

Ev rejîm li dinyayê teşhîr bûye, niha konferansekê navneteweyî ji bo çareserkirina kêşeya kurdî di rojevê de ye. Êdî her kes gihîştîye wê baweriyê divê kêşeya kurdî çareser bibe. Lê rejîm lê dixebite ku bi xûgî û bertilan dewletên împeryalist bi xwe girê bide. Êdî xûgî û bertil jî bi kêr nayên. Lewre jî giraniyê dide şerê psikolojîk û şovenizmê da ku agirê şoreşê di nava xwe bitefîne, lê tiştêkî wisa nepêkan e.

Hunera polîtîkaya proleter

M. MEHMO

Ferhengok

afînek: berhem,
alaza: doz
asûsa: pêdivî, ihtiyac
belekî: alacalîk
benav: dara kizwan û bitimê
berik: mersîk (kilim)
bertil: rûşwet
bilêkhatî: yekgirtî
çapandin: çapkirin
çawanî: west (nitelik)
çêlîkirin: behskirin
dabaş: mijar, babet
dahûrandin: analîz
destkarî: mudahale
destûmame: belgeya îzne
desteçî: cawfiroş
erdnîgarî: cografya
fermaname: talimat-name
fermanber: karmend, memûr
geç: ger
gewez: rengê bordo
giz: tîkîlî
gubor: mexela şevê
gunehbar: tawanbar, sûcdar
halan: nara
harîkarî: alîkarî, yarmetî
hewdik: kortika li ser keviran
kelîjn: kaynaşma

karçîn: hirmê
karistan: fêbrîqe
kunêr: çiban
lêbengbûn: evîna tundra
neguhêrbar: Değişmez
payeberz: rûteberz
pêhatî: rûdan, qewmîn
pêkan: mimkûn
pefîn: rizîn
peywîr: wezîfe
peywîrdar: wezîfedar
ponijîn: fikirîna bêhemd ya kûr
ramîn: fikirîn
ramyarî: siyasî
raz: sir
remegir: eleştîrmen
sazandin: sazîkirin, edîlandin
sazûman: pergâl, sistem
sosret: ecêb, gosartme
şewaz: ûslub
tavilê: yekser (hemen)
tavî: şerpîn (sağanak)
tepisîn: perçiqîn
têkildar: eleqedar
tiyan: çita darînî
tîndar: tiştê xwedî tîn
xûgî: xerec
xudewan: tanriça
zanistî: ilmî
zerîpoş: panzer
zîzok: vizvizok (topaç)

Polîtîka, şerekî bê xwîn e. Hunera xebitandina aqil e. Giranbûna cewher e. Xweşikbûn e, şekl e. Heybeta bîrdoziyê ye. Hêza guhartina merca ne. Polîtîka çiqas bibe bersiva mercan, a girîng jî çiqas xwe nû bike û xwe biguherîne, ew ças dikare hêzên dij bitirsîne.

Lê belê, ger polîtîka bi xwe jî ji listikên dij netirse, ne gengaz e ku karibe xwe biafirîne û bi ser bikeve. Pêwîst e ku polîtîka hem tirs be, hem bitirs be, hem jî bitirsîne.

Serokatî dibêje; "Navê min tirs e" yanî hem tirs e, hem ditirse, hem jî ditirsîne. Polîtîka di vê sozê de veşartî ye. Ev soz wateya tedbîr û lêgerîneke çawa ye ji bo guhartina merca.

Polîtîkaya ku îro Serokatî dide meşandin di merceke wisa zor de derketiye holê ku, êdî kurd ji kurdaiyê derketibûn. A girîng jî, jiyaneke bi siyaseta biyanan dijiyan. Çimkî bê îdeoloji jiyana dibûn. Serokatî, berhemê vê mercê ye. Di nava vê berhemê de psikolojiyê neteweyî heye.

Psikolojiyê ku di rengî hemû rêgezên serkeftinê di mîjî de çêdike. Jixwe psikolojiya ku ji bo serkeftinê be, bi xwe nivê serkeftinê ye? Tiştê herî girîng jî bo serkeftinê jî, ew e ku mirov di psikolojiya wê de jiyana bibe. Ev jî, wateya gihandina mîjîyêkî rêxistî ye. Yanî mîjîyêkî polîtîk. Di vê encamê de ger psikoloji ji perisîna hewmarî gihîştê perisîna çawanî wê demê dest bi pêva-

joya polîtîkayê dibe. Ango psikoloji dibê polîtîkayê birûmet.

Lewre dema psikoloji hundurê xwe bi polîtîkayê danegire, bi ramanêkê rêxistî danegire û sînore psikolojiyê qut neke, bê guman mirov ê di nava wê de bifetise. Dîsa ger polîtîka nebe mîjî û dilê psikolojiyê û ger psikoloji di jiyandê de nebe rastiyeke madî, wê gavê psikoloji jî bi serê xwe nikare tiştêkî bike. Encax bikaribe gaveke bi paş ve biavêje û serê xwe li hemberî hêza dij bitewîne.

Îro ciwanên kurd bi hunera xwe ya proleter, tirsî zanyar li çar aliyên cîhanê bi kar fînin. Li Dêrsimê Zilan, li Ewrûpayê Eser di zindanê de jî hevalê Fikrî û Sema Yüce.

Di vir da vîn, biryar û tirsê zanyarî tune. Cihê ku ev rêgez lê tunebin jî, jiyana lê tune.

Jiyana di hinek tirsan de veşartî ye, lê di her tirsê de jiyana ne veşartî ye. Tirsî nezantiyê tê. Lê jiyana ku di tirsê de veşartî ye, ne di tirsî nezan de ye. Jiyana ku veşartî di tirsî zanyar de ye. Tirsî zanyar serokatî ye. Di nava vê tirsê de polîtîka û di nava polîtîkayê de jî, hunera proleter cih digire. Jixwe ji bo vê yekê ku îro tevahî hêzên li dijî Serokatîyê ditirsîn û dixwazin ji holê rakin. Sû-iqasta 6'ê gulana sala 1996'an delîleke herî bi tirs e." Yanî baş dizane ku polî-

tîkaya ku Serokatî dide meşandin hêza li paş xwezayê îfade dibe. KT jî vê yekê dizane. Dizane ku Serokatî tirs e, tu kes nikare xwe nêzê bike. Heta sedemên ku KT naxwaze kêşeya kurdî bi aşîyê çareser bike jî, ji vê yekê derdikeve. Dibêje; "Ger ez destê xwe dirêj bikim, milê min wê here û ger ez milên xwe dirêj bikim, canê min wê tev here." Ew qasî ji tirsî zanyar ditirse. Lewre jî bo ku wê tirsî xwe veşêre, anga ji bo neqşa wî ya 'mezî' li hemberî cîhanê neşîkê û kes nebêje, KT jî Serokatîyê ditirse, dixwaze ku bi sîlehê polîtîkaya zirav bitirsîne. Belkî ew jî dizane ku Serokatî jî sîlehê natirse. Lê cudahî vê metodê dijmin, naxwaze ji tiştêkî din fêhm bike. Dewleta tirk heta îro bi derewan jiyaye û polîtîkaya ku îro dide meşandin jî, tev derew in. Lewre însanên zêf derewan dikin, derew jî tirsî nezanan çêdibin.

Encax îro, yên ku hevaltiya tirsî Serokatîyê dikin jî hene. Ew jî vê tirsê baweriyê, vîne û hêzê digirin. Îro ciwanên kurd tirsî zanyar li çar aliyên cîhanê bikar tînin. Li Dêrsimê Zilan, li Ewrûpayê Eser, di zindanê de jî hevalê Fikrî û Sema Yüce.

Mirovên ku di nava PKK'ê de cih digirin dil û mîjîyê xwe ji vê tirsê tîr dikin. Êdî wisa bûne ku li ku pêwîst be, li wir dipeqin. Çimkî bi qasî wan xwe bi tirsê tîr kirine, ew qasî jî tirsî di nava xwe de kuştine. Bi kinayî tirsî Serokatîyê, hunera polîtîkaya proleter e. Ev jî tîkîneke serkeftî îfade dibe.

Êrîşên li ser saziyên demokratîk gur bûn Dinya çareseriyê dixwaze, dewlet bombe dike

Li gorî daxuyaniya HADEP'ê di nava çar rojên paşîn de avahiyeke bajêr, yeke navçeyî ya HADEP'ê tûşî cerda hêzên dewletê dewletê hatine, gelek rayedar û endamên partiyê hatine binçavkirin. Digel van yekan malên gelek rayedarên partiyê bûne warê cerdên heman hêzan. Di wan cerdan de jî birek rayedarên HADEP'ê hatine girtin.

Dewleta tirk her ku li hemberî ra ya giştî ya navneteweyî dikeve tengasiyê êrîşên xwe gurtir dike. Van rojan li Parlemantoya Ewropayê raporek tê nîqaşkirin. Heke ew rapor bê pejirandin, dê sîwdariya dewleta tirk di vî parlamentoyê de jî bê çespendin. Di vî raporê tiştên xwestin: Ji bo çareseriyê kêşeya kurd, divê konferansekê navneteweyî bê lidarxistin; Divê dewleta tirk bi kurdan re li hev rûne; PKK ne rêxistineke terorîst e; Divê sîstema cerdevaniyê û operasyonên li şer Başûr bîn rawestandin. Di rapora navborî de tê gotin ku, Parlemantoya Ewropayê şewitandina gundan şermezar dike. Her wiha tê gotin ku divê dewleta tirk li hemberî kurdan dest ji bikaranîna şidetê berde.

Dîsa di raporeke ku li Îngilistanê li ser bazirganiya çekan hatiye amadekirin de jî, hikûmeta Tony Blair ji ber ku çekan difiroşe welatên wekî Tirkîyeyê tê şermezarkirin. Di vî raporê de tê gotin ku li Tirkîyeyê şerekî hundirîn heye û ew dewlet her tim beşekî Iraqê dagir dike.

Digel vî rewşa li derve, di şer de jî rewşa Tirkîyeyê baş xuya nake, li Başûr û Bakur êrîş û çalakîyên gerîla zêdetir dibin. Di çalakîyên hefteyekê de bi dehan leşker, polîs, cerdevan û PDK'yî hatin kuştin. Li gelek cihan rê hatin birîn, gerîlayan ji gel re propoganda kir. Qedexeya ku gerîla danîbû ser bazirganiya nefta (petrol) di navbera başûr û bakur de bandora xwe nîşan dide. Li gorî agahiyên ku bi dest ketine, kamyonên ku di çin û tîn bi awayekî berbiçav kêmbûne.

Li hemberî vî yekê dewlet giraniyê dide ser şerê psîkolojîk û berî dide çalakîyên ji bo tepeserkirina partî û saziyên demokratîk.

Nûnergeha Ü. Gündemê hate bombekirin

Şeva 20'ê pûşperê nûnergeha Êlihê ya rojnameya Ülkede Gündemê ji hêla hêzên (ne)diyar ve hate bombekirin. Ji ber ku kes li avahiye nîn bû, tiştêk bi kesî nehat, lê di warê madî de xesareke mezin çêbû. Ev êrîş ji hêla derdorên demokratîk ve bi çalakîyên cur bi cur hate şermezarkirin. Roja 23'yê pûşperê li ber Mûzexaneyê Çapemeniyê (Basın Müzesi) bi beşdariya dused kesî daxuyaniyêke çapemeniyê ji hêla Koordînatore Wêşanê ya Ülkede Gündemê Yurdusev Özsoğmenler ve hate xwendin. Di daxuyaniyê de hate xwestin ku zilm û zora li ser çapemeniya azad bê rakirin û êrîşkar zûtîrîn katê de bîn girtin. Civîna çapeme-

niyê bi sloganên "Dengê çapemeniya azad nayê birîn!" û "Pest û pêkufî nikarin rê li ber me bigirin!"

Ji bilî vî jî êrîşa li ser rojnameyê li Êlih, Stenbol û Enqereyê bi çalakîyên heman şeweyî hate şermezarkirin. Sazi-yên wekî HADEP, Özgür Halk, NÇM, Enstîtuya Kurdî, Azadiya Welat ve bi daxuyaniyan hate şermezarkirin.

Her wekî tê zanîn rojnameya Ülkede Gündem ev demeke dirêj e ku bi êrîş û pêkufiyên hêzên dewletê re rû bi rû dimîne. Di 1'ê berfanbara 1997'an de ji hêla Waliyê Rêveberiya Ne-asayî ve hate qedexekirin, li bakurê Kurdistanê belavkirina rojnameyê berî bi demekê hatibû berbandkirin. Du nûçegihanên rojnameyê di çalakîya girseyî ya 8'ê adarê de ji hêla polîsan ve hatin girtin. Piştî wê yekê polîsan avêt ser navenda teknîkî ya rojnameyê û di avahiye de lêgerîn pêk anîn, peyre jî du xebatkarên wê yek ji wan berpîrê Karê Nivîsaran Hayrettin Demircioğlu bû, hatin binçavkirin. Dewlet bi vî yekê jî nema, bi biryara DGM'ê îcar rojname deh rojan hatin girtin.

Dema hate dîtin ku piştî 10 rojan roj-



Bombekirina Nûnergeha Ülkede Gündemê ya Êlihê, bi girseyî hate protestokirin.


nameyê jî nû ve dest bi weşana xwe kir, îcar di 5'ê pûşperê de heyana bisansûr dest pê kir. Êdî rojname li çapxaneyê hatin desteserkirin, di cih de biryara berhevkerîna hate ragihandin. Piştî ku bi vî awayî nikaribûn li ber weşana rojnameyê bibin asteng, îcar kar spartin çeteyan û bombekirinan dest pê kir.

Êrîşên li ser HADEP'ê didomin

Roja 23'yê pûşpera 1998'an Serokê HADEP'a Enqereyê Kemal Bülbül bi şev ji malê, ji hêla hêzên dewletê ve hate birin. Bülbül piştî ku ji hêla Serdozgerê DGM'ê Nuh Mete Yüksel ve ji ber daxuyaniyêke çapemeniyê hate pirsîyarkirin, ji hêla DGM'ê ve hate girtin û ew şandin Girtîgeha Tîpa Sergirtî ya Enqereyê. Ev biryar li Kolana Yüksel a Enqereyê bi çalakîyêke girseyî bo çapemeniyê hate şermezarkirin. Bûroya Çapemeniyê ya Navenda HADEP'ê roja 25'ê pûşpera 1998'an daxuyaniyek belav kir û girtina rayedarên partiyê şermezar kir.

Dîsa li Amedê jî roja 23'yê pûşperê girtina Bülbül bi daxuyaniyêke girseyî hate protestokirin. Daxuyaniya çapemeniyê ji hêla Cîgirê Serokê HADEP'a Amedê M. Selim Kurbanoglu ve hate xwendin. Piştî xwendina daxuyaniyê girse sloganên mîna "Destê ku dirêjî HADEP'ê dibe, divê bişkê!", "HADEP gel e, gel li vir e, bijî HADEP!" berz kirin û belav bû.

Di daxuyaniyê de tê gotin ku, êrîşên



Kemal Bülbül

binçavkirin. Ji wan endamên û rayedarên partiyê Serokê HADEP'a Enqereyê Kemal Bülbül û Serokê HADEP'a Aydın İbrahim Alçiçek û çar rayedarên din hatine girtin, ên mayî hê jî binçav de ne.

Di dawîya daxuyaniyê de hatiye gotin ku, HADEP'ê heta îro digel êrîşên tund têkoşîna xwe domandiye, dê ji îro bi şûn de jî vî têkoşîna bi awayekî xurtir bidomîne.

Roja 25'ê mehê hêzên dewletê avêtin ser avahiya HADEP'a Bağcılarê û 50 kesên di hundir de girtin binçav. HADEP'a Stenbolê roja 24'ê pûşperê bi daxuyaniyêke ev cerda neqanûnî şermezar kir. Di daxuyaniyê de tê diyarkirin ku, sedema van êrîşan têkoşîna biryardar a HADEP'ê ya li dijî çeteyên ku xwîna gel û kedkaran dimije ye.

Mafê berevaniyê hate desteserkirin

Roja 25'ê pûşperê li salona DGM'ya 5'an danîşîna yekemîn a ku li rojnameya me hatibû vekirin pêk hat. Di vî danîşînê de Berpîrê Karê Nivîsaran ê Azadiya Welat Mehmet Salih Taşkesen daxwaza xwe ya ji bo berevaniya (parastin) bi kurdî diyar kir. Lê dozger û dadger ev daxwaz red kir. Li ser vî yekê M. Salih Taşkesen bi kurdî bersiv da pirsên dadger û da zanîn ku ew dê mafê xwe yê bêdengmayîna bi kar bîne. Ev biryara ne-hîqûqî ya dadgehê bi daxuyaniyêke hate şermezar kirin. Di daxuyaniyê de gotin ku têkoşîna ji bo berevaniya bi zimanê zikmakî bidome.

Dîrok bêjeya kurd û wêjeya kurdî (1)

Di nava qirna şanzdeh û hivdehan de tê xuyakirin berhemên bi kurdî ji gotinên olî û kilamî hatine pevxistinê. Tiştên ku di wan deman de hatine gotin bi du zaravayan hatine gotin; cizîrî û hewramî. Zimanê wêjeya kurdî di radeya sisêyan de di destpêka qirna nozdehan de, bi zaravayê Silêmaniyê derkete holê.

KEMAL FUAD

Bêjeya Kurd bi tenê dibe pênasî ji bo navê gelê kurd. Ev peyv ji bo gelê kurd di dema hatina îslamîyetê de derkete holê. (1) Lê bêjeyên ku wekî bêjeya kurd in, ew hê di demên berê de jî hebûn. Çawa ku dibêjin: "Welatê Kurdka" ku bi navê Mezopotamya dikeve navbera her du çeman (Dicle û Fêrat). Li gorî agahiyan navê wî welatê li ser du keviran bi nivîsa Somerî hatine dîtîn û dîroka wan nivîsan, bi hindikî digihîje 2000 sal beriya jidayikbûna Îsa (2). Dîsa Kesnefon, serişker û dîroknasê Yewnanî yê bi nav û deng di pirtûka xwe ya bi navê "Anabasis" de li ser qewmînen di navbera leşkerên xwe û kesên di wê deverê de, di dema zivirîna bi deh hezar ve, di sala 401-400 beriya zayînê de, wî gelê bi navê "Kurdox" bi nav dike (3). Lê di pirtûka, "Karnamakî Ertaxşîrî Babakan (Pirtûka kirinên Erdeşîrê Kurê Babak)" de (4) dide nîşan ku Sasan (Bavê bi rastî ji bo Erdeşîr) bi salan xwe di nava "Kurdan Şobanan (Eşîrên kurdan)" de veşartibû. Ev pirtûka hanê bi şer û cenga di navbera Erdeşîr û Padişahê Kurdê bi navê "Madek" re mijûl dibe. (5) Lê hema di wê pirtûkê de tu berhemeke bi zimanê kurdî nayên nîşandayin. Lê bawerîya herî mezin di nava rêzên dîroknasan û arkeologan de, ewên ku bi giringî li ser mijara koka nijadê kurd û bêjeya "Kurd" radiwestin wiha dibêjin: "Kurdîstana ku îro heye, ew di qirna yekemîn berî miladê de, welatê Îranî bûye. Lê bi pêşveçûna gelê kurd digel bawerîya van dîroknasan û arkeologan jî ew gelê bi navê "Med" bû xudan bingeh di devera bakur û bakurê rojhilatê Mezopotamyayê de. (6) Hem jî ev gel bû xudanê şînuwarekî kevnare, di dema ku malbata zimanên "Îranî" bûye du beş; Beşa bakurê Îranê û beşa başûrê Îranê. Zimanê kurdî dikeve nava zimanê beşa bakurê rojava. Bi vî awayî Oskar Mann û Mînorîskî, di navbera her du beşên zimanên Îranî de beşa kurdî bi zimanê bakurê rojavayî bi nav kirine. Yanî ji beşa zimanê kurdî re gotine beşa bakurê rojava. (7)

Yekemîn berheman bi kurdî dizivîre sedsala 16'an

Lê bawerîya zexm a ku di beriya îslamê de bide nîşanê mirov ku nivîsa bi kurdî heye, ne balkêş e. Ew nivîsên kurdî yên ku "Îbnû wehşê Nebatî" di pirtûka xwe ya bi navê "Şewqul Musteham Fi Merîfeti RumûzulEqlam" de qal dike, ew jî ku rastî 855'ê piştî zayînê tê, ew ne



Malbata Baderxaniyan di parastin û pêşvebirina çand û wêjeya kurdî de risteke mezin lîstin. Di wêne de malbata Bedirxaniyan tê dîtin

rast e. (8)

Dîsa ji bo destnivîsa bi zimanê kurdî ya berî îslamê, wan beytên ku deng dane di nivîsa şîrên "Hirmizkan reman, Atran Xezan" (Hilweşiya peristgeha Himiz û agir jî tefîya) de, hem jî wan nivîsên ku digihînin bal dema girtina Kurdistanê ji hêla ereban ve di qirna heftan de, bi zelalî ew gotin ji ber xwe derxistin. Yanî tu giza wî bi berhemên dîrokî yên zanistî re tune.

Her wisa beytên Şairê bi navê "Baba roxîl Hemedanî" ku dibêjin beytên wî jî kurdî bûne, giza wî jî bi rastiye ve tune. (9) Ew gotinên der barê hinek şairên kurd de, hem jî ew ên ku Aleksander Jaba ji devê "Mehmûd Beyazîdî" hildaye, pêdiviya wê gotinê jî li bal rastkirina bi hindikî 400-500 salî heye. (10)

Min ev nerastî û çewtîyên dîrokî ku ew di pirtûka xwe ya bi navê "Kurdische Handschriften" de ewa ku di Fizyanden li Almanya di sala 1970'yî de çap bû û çapa wî ya nû ya ku bi îngilizî ye de, dîsa ez dibînim ku Thomas ketiye nava çewtîyên pir mezin. Di birekî gotinên xwe yên der barê kurdan û Kurdistanê de, di mijaren ku xwe dikirin bi nav û pirtûkên wan û mijûlahiyên ji jiyana

wan. (11) Edebiyata neteweyî ya kurdî, çî bi nezim çî bi nesir, hem jî bi cur bi curên zaravayên kurdî heta nîveka qirna nozdehan, nehatine berhevkerin, çapkirin. Hem jî ji mehalê ye ku mirov temenê yekî ji van berhemên edebî yên kurdî êşkêre bike û bêje: Ev berhem di vê salê de derketiye. Berhema herî kevnare der barê edebiyata kurdî de derketiye holê, dizivîre bal qirna şanzdehan û ya hivdehên miladî. Wêjenasê kurdî yê ku di nava qirna şanzdeh û hivdehan de tê xuyakirin berhemên wî bi taybetî û giranî ji gotinên olî û kilamî hatine pevxistinê. Dîsa em dibînin ku berhemên di wan qirna de, yên cengawerî romantîkî û mîranî jî li pey yên olî û stranî tî. Tiştên ku di wan deman de hatine gotin bi du zaravayan hatine gotin; cizîrî û hewramî. Zimanê wêjeya kurdî di radeya sisêyan de di destpêka qirna nozdehan de, bi zaravayê Silêmaniyê derkete holê. Her çiqas hinek pisporên civaknasên welatê îranê yên ji Ewrûpayê dibêjin: Hewramî zaravakî Îranî yê rojavayî ye û ne zaravayekî kurdî ye. (12) Jî, hewramî di destpêka sedeya nozdan de yek ji zimanê wêjeyê di beşekî mezin de di Kurdistanê de, ji Zapê hetanî Kermansahê di hate jimartin. Di dîv re, ev zaravayê

hewramî ji beşa kurdî ya wêjeyî hêdî hêdî rabû û wînda bû, lê zaravayê Silêmaniyê xwe di şûna wî de bi cih kir. Piştî vê qewmîne, ji bilî hindik caran wêje bi zaravê hewramî nehatê nivîsandinê.

Ew şair nivîskar û wêjenasên kurd ên ku xudan par bûne di parastin û pêşvebirina zimanê kurd de û hem jî xebatên pir hêja dane meşandin di rîya parastina nasnameya gelê kurd de, mirov dikare bi taybetî wan di vir de bi nav bike. Wekî çawa di devera kurdî ya rojavayî de (kurmançiya bakur) de, Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî, di nava sedeya şanzdehan û ya hivdehan de, tîne dîtin.

Di devera Hewramî (Goranî) de jî Mele Perîşan, Elmas Xan, Xan Qubadî û Mewlewî Tawkozî, di serê sedsala pînzdehan, hijdehan û nozdehan de tîne dîtin. Yanî ji wan zanayên ku ziman, wêje û nasnameya gelê xwe parastine û bi pêş ve birine. Di devera rojhilata Kurdistanê de jî (kurmançiya başûrî) de Nalî, Salim, Kurdî, Goyî, jî di sedsalîya nozdehan de tîne dîtin. Di warê parastina nixêrên gelêrî yên kurdî de.

Ji Erebi werger: Celalettin Yöyler
Dê bidome

Rêzimanê kurmancî

- Wane 17 -

SAMÎ BERBANG

Di rengdêran de paye

Di rengdêran de paye, rade payeya tişteki nîşan dide, payeya asayî, payeya hevrûkirinê û payeya rajorîn.

Em dikarin bi mînakekê mijarê rave bikin. Peyva "bilind" rengdêreke di payeya asayî de ye. Dema em bibêjin; "Dara gûzê bilind e.", ew li ser pîvanên bilindiyê tu tiştê nabêje, tê zanîn ku li gorî pîvanên giştî ew dareke bilind e. Lê dema dareke din hebe, mirov wan her du daran bide ber hev, wê gavê mirov ji yekê re dibêje "Ev dar ji ya din bilintir e." Heke dareke ji hemû darên heyî bilintir li holê hebe, wê gavê mirov divê bibêje; "Ev dar ji hemûyan bilintir e.", "Dara herî bilind ev e." Ji bilî van şeweyan mirov dikare bi awayê "Dara bilintirîn ev e." jî bibêje. Ev şeweyê dawîn her çiqas ji zaravayên kurmançiya jêrîn (sorani) hati wergirtin jî, niha di zimanê nivîskî de bi berfirehî tê bikaranîn. Li ser vê mijarê jî çend mînak:

Birayê min biçûk e.

Ez jê mezintir im.

Kekê min mezintirînê me ye.

Tirî xweş e.

Lê sêv ji tirî xweştir e.

Fêkiya xweşiktirîn xox e.

Îsotên aliyê me tûj in.

Lê yên Mêrdînê tûjtir in.

Îsotên herî tûj li Ruhayê peyda dibin.

Rengdêrên ku em dê ji niha bi şûn de li ser rawestin, ji aliyê Mûrad Ciwan ve wekî di bin sernavê "rengdêrên diyarkirinê" de hatine civandin. Taybetiya wan ev e ku ew cure rengdêr di binyata xwe de ne rengdêr in, lê dema dikevin ber navdêreke dibin rengdêr.

Her wekî berê jî hatibû diyarkirin, rengdêrên ku ew çêli wan dikin ev in:

Rengdêrên şanîdanê, rengdêrên jimarîn, rengdêrên pirsîyarî, rengdêrên nebînavkirî. Dema mirov baş bala xwe bide wan, dê were dîtîn ku ew di bingeha xwe de cînavk an jî hoker in, lê dema ketine ber navdêrê bûne rengdêr. Ji ber vê yekê jî hinek taybetiyên cînavkan di wan de jî hene. Di rastiya xwe de rengdêr ji birên hevokê yên neguhêrbar in. Lewre rengdêrên çawaniyê natewin. Heke nebin nav û cînavk bi awayî natewin. Lê ew rengdêrên diyarkirinê ditewin.

Mala sor a me ye.

Ez ji wî gundê xweşîk tîm.

Bejna dirêj bi kêrî çî tî?

Dema em bibêjin;

xweşîkê got.

Soro hat.

Xuya ye ku li vir ew her du rengdêr

bûne navdêr lewre jî hatine tewandin.

Wekî din di rengdêrên çawaniyê (wesfîn) de tu guherîn pêk nayê her tim wekî xwe dimînin.

Rengdêrên şanîdanê

Ev rengdêr, ji bilî cînavkên şanîdanê ne tu tişt in. Cînavkên me yên şanîdanê du cure "Ev, ew" pê ve ne tiştekin in. Dema ew dikevin ber navdêran wan nîşanî mirov didin, lewre jî dibin rengdêrên şanîdanê. Gava em dibêjin

Di hevoka "Ev çû mala xwe." de "ev" cînavk e, lewre cihê kesekî girtiye, wî nîşanî mirov dide; lê dema mirov he-man hevokê bi şeweyê "Ev heval çû mala xwe." saz bikin, wê demê "ev" dibe rengdêr. Ev her du rengdêr xwerû ne, tu qertaf negirtin. Lewre jî dikevin ber navdêrên xwerû wan dinimînin. Bo nimûne:

Ev gundî duh ji bajêr hatin.

Ev bajar gelekî mezin e.

Ew heval ji min re navê xwe dibêjin.

Ew mal, ji mala me xweşiktir e.

Her wekî ji mînakên jî diyar e, rengdêra "ev" navdêrên nêzik, "ew" jî yên dûr nîşan dide. Pirjimariya wan jî bi alikariya lêkerê tê zanîn.

Dema ew cînavk ditewin, qertafên tewangê /-î/, /-ê/ û /-an/ digirin û "ev" dibê;

Evî (nêzik, nêr), ewê (nêzik, mê), ewan (nêzik, pirjimar).

Ew jî dibe;

Ewî (dûr, nêr), ewê (dûr, mê), ewan (dûr, pirjimar). Di zimanê nivîskî de "e"ya destpêkê dikeve, ew jî dibin;

Vî, vê, van; wî, wê, wan.

Ev cure rengdêr navdêrên tewandî nîşanî mirov didin. Taybetiyeke rengdêrên şanîdanê yên tewandî ev e ku bi xwe re navdêrên li pey xwe jî ditewînin. Wekî mînak;

Min ji wî hevalî re got.

Wê hevalê ji min re negot.

Wan hevalan li mala me nan xwar.

Vê xwişkê ez nedîtîm.

Vî birakî ter li dora xwe nenihêrt.

Van hevrêyan çî got?

Li hin herêman, her wekî rêpîvanên din ew rêpîvan jî ji holê rabûye. Bi taybetî zayenda navdêran têkilî hev bûye. Ji ber vê yekê jî "Min ji vî hevalê re got" dibêjin. Ev şeweyê jî binî ve xelet e û divê mirov nexe zimanê nivîskî. Rêpîvana giştî ya ji bo tewangê ji bo rengdêrên şanîdanê jî derbas dibe. Yanê di lêkerên gerguhêz de, di demên borî de kirde, di demên niha û bê de jî bireser ditewe. Wekî mînak:

Min ev heval dît.

Wî hevalî ez dîtîm.

Ez van hevalan dibînim.

Ew heval min dibînin.

Vê keçîkê nan anî.

Ev keçîk nên tîne.

Kurd û Îtalya

NEJDET BULDAN



Nêzikî du salan e Îtalya di rojê kurdan de ye. An jî kurd di rojê Îtalyayê de ne. Eger kurd di rojê wan de bin an jî ew di rojê kurdan de bin bi giştî hevaleyê din jî heye; dewleta tirk. Wekî ku di stranê kurdan de dibêjin: "Lo lo Elo, hevalê xayîn". Di van rojan de jî dewleta tirk her tim hevalê me ye.

Îtalya welatekî ewrûpî ye. Di nava Yekîtiya Ewrûpayê de endam e. Di hêla pêşveçûnê de li cîhanê hêzeke mezin e. Lê mixabin, wê jî ji destê mafayê pir tengasî derbas kirine. Di welatê xwe de, bi hêz û sazî têkoşîneke gelek mezin li dijî mafayê meşandiyê. Hêsta jî dimeşînin. Li gorî agahdariyên ku me ji rayedarên wan girtine, têkoşîna wan ya li dijî mafayê neqediya. Dibêjin: "Mafya nayê xelaskirin. Lê belê mirov dikare wê bixê bin kontrolê. Me jî neqetandiyê. Bi tenê me ew xistiye bin kontrola xwe."

Îtalya di sazûmana dewletê de mînakeke

taybet e. Bi federatîfî tê birêvebirin. Lê ne bi federatîfîya ku li Ewrûpayê tê meşandin. Ne wekî Swîsre an jî Almaniyayê. Sistema federasyona wan taybet e. Rêvebertiya wan mijareke akademîk e û bi çend gotinan ji nayê fêmkirin. Ji ber vê çendê em li ser sistema wan nasekinin.

Îtalya welatê Derya Spî ye; bi avûhewa, xwezayî û bi kulturî. Di teknîk û pêşveçûnan de ewrûpî ye. Di teşqeke û diziyana de jî afrîkî ye û wekî Rojhilata Navîn e. Ji ber wê çendê jî şerê Cîhanê yê Duyemîn şûn de tu îstîqrar negirtiye. Nakokiyên desthilatîyê tu caran xelas nebûne. Abofî bi destê rayedarên hevalbendên mafayê hatiye pûçkirin. Di pêncî şalên dawiyê de Îtalya ji krîzên siyasî xelas nebûye.

Têkiliyên şoreşa Kurd û Îtalyayê xurt in. ERNK'ê bi fermî bûroya xwe li wî welatî vekirîye. PKDW her tim têkiliyên xwe yên fermî bi rayedarên dewletê re dimeşîne. Civîneke PKDW'ê di 1996'an de li Romayê çêbû. Gelek parlamenter û serokên belediyeyan beşdarî civînê bûn. Gelek çalakî û konferans bi beşdariya gelek siyasethanên pêk hatin. Sala borî koçberiya kurdan bi destê Îtalyayê kete rojê cîhanê. Dewleta Îtalyayê li dijî hemû êrîş û gefên tirkî parastina kurdan kir. Hem di welatê xwe de hem jî di qada navneteweyî de. Li dijî hemû êrîşên Almanya û Brîtanyayê, li dijî êr-

şên endamên Yekîtiya Ewrûpayê parastina koçberên Kurdistanê xiste ser milên xwe.

Rojên borî li Romayê civîneke mezin dest pê kir. Civîna Neteweyên Yekbûyî ji bo amadekirina "Dadgeha Gunehbarên Şer". PKDW'ê bi harîkariya rewşenbîr, hunermend û saziyên kurdan meşek li Romayê çêkir. Ji bo ku dadgeheke tawanbarên şer bête sazîkirin, me piştevaniya xwe eşkere kir. Paşê jî me civîneke bi parlamenterên Îtalî re çêkir. Hemû nûnerên partiyên desthilatîya Îtalyayê beşdar bûn û bi kurtî gotin û biryarên wan ev bûn:

**Ji bo çareserkirina pirsgerêka kurd çî dikeve ser milê me emê bikin. Em PKDW'ê bi fermî wekî nûnerê gelê kurdan nas dikin. Ji bo ketina navbera kurdan û dewleta tirk, serokên parlamento û senatoya me dê bixebitin. Em ê harîkariya wan bikin.*

**Ji bo çêkirina konferanseke navneteweyî em ê bixebitin. Ji bo ku li NY'ê li ser pirsgerêka kurd bê axaftin, em dê hewl bidin. Eger "Dadgeha Tawanbarên şer bête damezirandin, em dizanin ku piranî ev ji bo gelê kurd baş e.*

Belê Îtalya pêngavên girîng dihavêjt. Em nizanin ku encamên wan xebatan dê çî bin. Lê em baş dizanin ku li gorî hemû mercên tengav û xirab ên di warê civakî de jî, di warê siyasî û leşkerî de li ser çareserkirina pirsgerêka Kurdistanê xebatên baş tên kirin.

Li wir, li welatê min!

Ez zanim vê sibehê dayikekê li çogan xist, por û keziyên xwe anîn xwarê, ji ber zilma gurê devbixwîn. Vê sibehê ez pê zanim, dîsa dayikekê dest li pişt kurê xwe xist û bo şer bi rê kir. Li lat û çiyayên bejneke din bilind bû.

Ew roja ku di ber pozê çiyayên bilind de hildibû, tîrêjên xwe yên germ, li hawîrdorê diweşandin û wekî dayikeke dilovan ez hembêz dikirim û bêhna gul sosinan li ser min dixist. Lê îro ji min pir dûr e. Tîrêjên xwe nagihîne min. Ez ji germahiya wê bêpar im.

Li welatekî xerîb û li bajarêkî nenas, vê sibehê ez çiqas bêxwedî û belengaz im. Destên min di bêrka min de, di nav kolanên bajêr de dimeşim, hêdika û bêdeng. Diponijim û mêjiyê min bi ramanê dagirtî. Ji ber vê biyaniyê stûxwar û çiqas sêwî me. Hêdika gav davêjim. Ne tîrêjên rojê yên tîndar û ne jî bêhna gulan. Dicemidim, diricifim û qirik tahl im.

Vê sibehê li vir, li vî bajarî biyan, ne çiyayên serbilind hene, ne jî zinar û latên gerden azad û ne jî zozan û delavên gundê min... Ka nabîhîzim dengê gujîna çeman li berbangê? Ka ewtîna sehên gurêx û ka nayê guhê min merîn û kalîna pez û berxan? Ka nabînim zilamên simbêlreş, digel jinên serpeçayî?

Vê sibehê, li vir, li vî bajarî xerîb, ez nizanim ka çi demsal e? Ez bi hesreta berfa ku wekî xewnên keçên çardeh salî, qerqas û spî mame. Xewnên min reşqehîrîn e û wekî qîr û qetran in. Ez bi hesreta pûk û seqema zivistana welatê xwe mame. Min bêriya egalên reşbelek û nexşo mexşo kiriye. Ez her sal li benda bihareke ewrhêşîn û bahênîk im. Bihara ku bi deşt û çiyayên xwe yên keskor, ku hemû biharên din jê çav-

nebar dibin. Ez li hêviya wê biharê me. Biharê welatê Serhedê, ya Amedê û Culemergê...

Lê havîn û payiza min? Çiqas xweş bû ku cotkar û paleyan ku di mêrg û zeviyên bêsinor de halan didane hevdû. Te digot qey di dîlanan de govendê digerin. Li vî bajarê han, ku ez çav bi karkeran dikevim, dibêjim qey ji dare îşkenceyê nû filitîne. Wisa zer û zerçiqî û xemgîn im. Ku bala xwe didim wan destê min ji dinyayê sar dibe. Ku bala xwe didim rûçikên wan, yên bi lome, diyar e ku ji min bêhtir bêkeys ketine. Wê gavê kula min xedartir di-be...

Ev welat, ev bajar ji min re bûye zindan. Bêhn li min diçike, difetisim. Aweke wekî vereşiyê ji bin himên karistanan dikeşe. Bêhna wê madê mirov tîrş dîke. Vê demê ez çemên avzela û kaniyan avşêrîn bi bir tînim.

Waye çend bihar hatin û derbas dibin. Lê min tu gulên rûgeş nedîtî. Çavên min tu car bi gihayên xweşbîn û hêşîn nakevin. Lê di nav kolanên de qe-



Belê ew der welatê min e, li wir bihar dîn û har e, bi xeml û bedew e. Xwîna keç û xortan dikelîne, wan evîndar dike. Ji ber sewta biharê jiyan dibe xezaleke kovî û dibeze li kaş û kerîşan, li Sîpan û Xelatan...

ratiyên reş li ber çavên min dikevin, lê nizanim mirov in an jî stûn û dar in? Li ber çavên min her tişt hemreng e.

Çawa bêjim ji we re? Ez li vî bajarî, wekî teyrekî baskşikestî me, diperpitim. Lê ji firê bêguman im. Her wekî di nav lepên xeribiyê de dil im. Ez sews im, gêj im. Nizanim li vir li vî bajarî xerîb çi demsal e?

Lê vê demsalê li wir, li welatê min, ez pê zanim ku bihar e. Zanim ku li aliyekî bombe barandibin, li aliyê din gulên sor û gewez dipîşkivin, li eniya mêrg û zeviyay. Li aliyekî mazî dişewitîn, li aliyê din benav û bî pel vedidîn, li qeraxên çeman. Zanim li aliyekî wêran dibin gund û bajar, hildiweşîn, ditepîsin xanî û bircên kevnare, li aliyê din çiya û lat serî hildidin û bilind dibin zinar.

Ez zanim vê sibehê dayikekê li çogan xist, por û keziyên xwe anî xwarê, jî ber zilma gurê devbixwîn. Vê sibehê ez pê zanim, dîsa dayikekê dest li pişt kurê xwe xist û bo şer bi rê kir. Li lat û çiyayên bejneke din bilind bû.

Hûn ji min bipirsîn, ez pê zanim. Lewre ew der welatê min e. Li wir li serê çiyayên bager û bahoz radibe, wan bayê evîne, car caran hênîk dibe. Rû û rûçikên devbix-

wînan jî reş dike, wan dihetikîne û dixê dilqê kûçikan. Li wir mîrxasî bela serê ixanetî û teresiyê ye. Eniya xwe diqermiçîne û dide ber lûleyên çekan û rojê hezar car li ser hev tê kuştin. Mirin karûbarekî ji rêzê û pêwîstiyêke jiyanê ye. Mirin jiyan e. Jarjorên çekan bi guleyê jiyanê avis in, çiqas gulê bizên, ewqas jiyan gur dibe, dibe govend.

Li wir mirin tu caran bi ser neketiye. Hevsarê serketinê tim di destê jiyanxwaz û azadîxwazan de ye. Mirin jiyanê diafirîne, jiyan jî hêviyê... Li biharan hêvî zil dide, şîn dibe, dixemilîne rûyê erdê. Ji belekiyên berrê cihok, ji cihokan newal, ji newalan jî Murad û Fera-dan diafirîne. Hêvî mezin e, difilite deştan, dibe derya hêvî.

Belê ew der welatê min e, li wir bihar dîn û har e, bi xeml û bedew e. Xwîna keç û xortan dikelîne, wan evîndar dike. Derman dixê nav çog û qidûmên kal û pîran, birînên wan bi gulên sor û gewez diceribîne. Ji ber sewta biharê jiyan dibe xezaleke kovî û dibeze li kaş û kerîşan, li Sîpan û Xelatan...

Welato! Ez vê carê bi saxî bigihêjim ba te, ez ê li ser qada te çog vedim û ez ê wê axa te ya şêrîn çeng bi çeng vexwim. Heta ku sax bin birînên min û heta ku hesreta te ji dilê min biweşe, ez ê te ramûsim, kevir bi kevir, dar bi dar û pel bi pel...

RIFAT DUMAN



Ez her sal li benda bihareke ewrhêşîn û bahênîk im. Bihara ku bi deşt û çiyayên xwe yên keskor, ku hemû biharên din jê çavnebar dibin. Ez li hêviya wê biharê me.

□ 30 pûşper 1925:

Şêx Seîd û 47 hevalên wî hatin darvekirin

Ber bi dawîya serhildana Şêx Seîd ve, dewleta tirk dest bi polîtîkayên qirêj kir. Hin eşîrên kurd kişandin aliyê xwe û di rîya trêne ya xeta Mêrdînê re leşker kişand ser Amedê. Hêzên kurd li Amed û Elezîzê têk çûn. Şêx Seîd neçar ma ku hêzên xwe bi aliyê bakurê rojhilat ve bikişîne. Çaqêk ji wî re kemînek danî. Şêx Seîd tevî hêzên xwe yên mayî li nêzikê Mûsê ji aliyê leşkerên tirk ve di hate gertin. Dewleta tirk roja 30'ê pûşperê li Amedê tevî 47 hevalên wî ew bi dar ve kir.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 2 pûşper 1993:

Hotêla Madîmakê tevî 37 kesan hate şewitandin

Hotêla Madîmakê ku gelek hunermend, rewşenbîr û nivîskarên ku ji bo şahîya Pîr Sultan Abdal çûbûne Sewazê lê diman, ji ber axaftineke nivîskar Aziz Nesin ji hêla elperest û kevnepereştên faşîst ve hate şewitandin. Di encama vê şewitandinê de Aziz Nesin sax filîfî, lê 37 kesan di vê êrişê hovane de can dan.

Li NÇM'ya Şaxa Edeneyê Komeke nû**Koma Sarya**

“Çawa ku li Çukurovayê li Çiyayên Torosan agirê şoreşê gur dibe em jî dixwazin bi helbest û stranên xwe dilê beşdarên meşa şoreşgerî û azadiyê geş bikin.”

Koma Sarya di sala 1997'an de di bin banê Navenda Çanda Mezopotamya Şaxa Edeneyê de dest bi kar û xebatên xwe yên mûzîkê kir.

Koma ji 8 kesan pêk tê. Amûrên mûzîkî yên wekî baxlama, gîtar, ney, cûra û ji amûrên ritmê jî defê bi kar tîne. Kom di nav şertên dijwar de, bi hêzeke têkoşer xebatên didomîne. Koma Sarya bi muzîka xwe tarzeke nû kir nav muzîka kurdî di nav xebatên nûjenkirina mûzîka kurdî de cihê xwe girt. Koma Sarya, wekî diyar e, navê xwe ji şehîda şoreşê Sarya (Nursen İnce) girtiye û bi armanca hêzeke şoreşgerî û neteweyî derketiye ser qada mûzîkê. Ji endamên komê Serhat wiha dibêje: “Têkoşîna rizgariya neteweya me ber bi azadî û serfiraziyê ve dimeşe û her wiha di warê çandî û hunerî de jî sazîbûnê bi xwe re tîne. Çawa ku li Çukurovayê li Çiyayên Torosan agirê şoreşê û şoreşê gur (geş) dibe em jî dixwazin bi helbest û stranên xwe dilê beşdarên meşa şoreşgerî û azadiyê geş bikin.”

Ji endamên komê Veysi jî li ser pirsê me ya bi rengê ‘armanca we di pêkanîna komeke bi vî rengî de çi ye?’ wiha got: “Em dixwazin li çand û hunera kurdî bikolin, bi taybetî klamên

ku di nav gel de mane, derxin holê û wan klaman bi rengekî nûjen çêkin.”


Koma Sarya bi mûzîka xwe di mûzîka kurdî de cihekî nûjen vedike û cihê xwe di nav hunermendên mûzîka kurdî de digire, mûzîka kurdî bi pêş dixê. Di nav stranên komê de, huner bi şoreşê hatiye neqîşkirin. Stranên Koma Sarya, li ser şer û şoreşê ne. Ji stranên komê bêhna bayê azadiyê, bêhna bihar û aştîyê tê.

Wekî tê zanîn, Salona çalakîyan a NÇM'ya Edeneyê hatiye mohrkirin. Ji ber vê yekê Koma Sarya jî wekî komên şaxê, yên din bernamêyên xwe li şevan û dawetan pêşkêşî gel dike û di van çalakîyên xwe de serkeftinên mezin bi dest dixê.

Endamên komê û amûrên ku bi kar tînin ev in:

Serhat: Solo û baxlama
Veysi: Solo û baxlama
Uğur: Vokal û gîtar
Gulbahar: Gîtar û solo
Salih: Ritm
Fatoş: Ney
Şengül: Cûra û solo
Gökçe: Gîtar û solo

FEYZULLAH YILDIRIM / EDENE

ÇAVDÊRÎ**Ecevitê bavkurd**

SERKAN BRÛSK

Meseleyek me kurdan heye. Li nav xelkê pir belav bûye. Hema bêjin kesekî/e ku nebihîstibe tune ye. Heta ev serpêhatî wekî şîret, li gelekên ji me, ji aliyê dapîr û bapîran ve, ne carekê lê gelek caran hatiye kirin. Bi rastî jî divê em vê meseleya pir bi wate timî bi bîra xwe bînin.

Werhasil ez gotinê zêde dirêj nekim. “Dibêjin zilamekî ji kurê xwe re gotiye ‘lawo tu nabî zilam’. Ev gotin li telê kurik ketiye, pê pir eşiyaye. Ev gotin laîqî xwe nedîtiye lê dengê xwe jî nekiriye. Di dilê xwe de gotiye; “Bila ehda Xwedê be, ez dê rojekê ji rojan ve gotinê bi bîra te bînim.” Çend meh, demsal, sal û dem û dewran di wê navê de bihurîne, ez nizanîm. Lê wisa xwiya ye ku ciwanê me, xwe baş daye xwendinê û bûye bûrokratekî têra xwe maqûl û xwedîgotin, di nav dewletê de. Heta tê gotin ku bûye welî. Roja ku li ser kûrsiyê xwe rûdinê û fitlekê dide kursiyê xwe û xwe wekî zîzokê li dora xwe dizivirîne, gotina bavê xwe bi bîr tîne. Ew gotina ku qet ji bîra wî demeketibû. Hema bixar (lez) gazî berdestê xwe dike û fermana xwe wiha dibêje. Tu dê di nigê nigdan de herî filan gundî û kalê bi navê (em navekî li bavê vî maqûlî(!) bikin; em navê bavê wî bikin ‘Heskê’) Heskê bîni. Û eseh eseh tembî dike ku aliyekî rîha wî qusandî û aliyê din ne qusandî jî be, wî bi xweşî yan bi zorê bide pêşîya xwe bîne. Em kin lêxin berdestkarê feqîr û pîreş di nava çend saetan de kalo tîne huzûra walî. Walîyê zilam(!) xwe dinepîxîne û ji xulamê xwe re dibêje derkeve. Bi dengê bilind ji kaloyê bêhnçîkiyayî û tirsîyayî re dibêje: “Biqedim! Ma te ez nas nekirim.” Kaloyê reben bîra mirîna xwe dibe lê bîra ku ev ê li himberî wî rawestîyayî, dê kurê wî bi xwe be, nabe. Evdalo xwe dikişîne hev, dibe wek lepekî. Bi dengê nizmî tirsok di ber xwe de dibêje: ‘Nexêr’.

Pîştî piqîneke fehş walî beg xwe bi bavê xwe dide naskirin û bi tahlî dibêje: “Tê bîra te, te ji min re gotibû, tu nabî zilam. Baş binêre ez îro walî me.” Dema gotina maqûl efendî diqede, kalo dibêje: “Min negotîbû tu bilind nabî û nabî xwedî meqam û kursî, min gotibû tu nabî zilam.”

Çi cara ku navê hinek bûrokrat, parlament, karmend û xwedîkaran dibî-hîzim ku li ser esasê înkarkirina esl û feslê xwe gihane van mevkîyan û ev meqam bi dest xistine, ev meseleya jor tê bîra min. Îcar hejmara van bêeslan jî ne hindik e. Ji ber tenê rîya bilindbûn û mezinbûnê li Tirkî di vir re derbas dibe. Yanî tu divê li hemberî derbasbûna xwe şer bikî. Divê benkê xwe ji derbasbûna xwe qut bikî. Û xwe bi hemû hêza xwe bikî tirkê herî heqîqî. Divê bibî kesekî tirkparêz. Kesên wisa ji tirkan jî tirkîrî dibin. Û jixwe piştî demekê êdî kemilîn temam dibe. Hafîze û bîr tê paqîjîkirin. Piştî vê prosesê êdî kes nema wekî berê ye. Ferd dest pê dike nijadperestiya tirkan ji wan pir bi daxwaztir û bawertir diparêze û bi hemû hêza xwe, dixwaze vê nijadê firehtir bike. Jixwe xayîntî ji vir bi xwedî dibe. Xayîntî, bi xweînkarkirinê re dest pê dike û bi navêtiya nasnameya xwe û divêtiya nasnameya dijmin jî, tê mohrkirin û dikeve jiyana.

Ger em li birêvebirîya dewleta tirk binêrin em dê li dehan kesên bavkurd rast bîn. Bi dehan kesên navdar ku bi heft bavê xwe kurd in, îro di parlamentoya tirkan de hene ku serkêşîya tunekirina nijada xwe dikin. Bi rastî jî ji tirkên ku şîrê Dêlegura Asenayê mêtine jî hartir in. Wek Ecevit. Ecevit jî kurd-e? De îcar bawer bikin? Lê Giyasetîn Emre di Nûbiharê de dibêje li ser kêla bavê wî wiha hatiye nivîsandin: “Haza qebru Mustafa Beg, min umerâfî Elkirat (kurd)”. Ecêb e wileh, çawa heta niha Ecevit kêla bavê xwe bombe nekiriye?

N e v î t o l a k a l i k

Govenda azadî

Tertele angî komkujî ji bo gelê kurd ne tiştêkî awarte ye. Li xaka Welatê Rojê qêrîn û hawaran her olan daye. Wekî diyar e, roja 29'ê pûşpera 1925'an salvegera dan şervana ARGK'ê Zîlanê (Zeynep Kınacı) li navenda Dêrsimê, li ser yekîneyeke leşkerên tirk çalakiyêke fedayî pêk anî. Li hev gihîştina salvegera van her du bûyeran îroniyê Zeradest û Şêx Seîd xwe bi êgir dişon û daxwaza guhartina bextê reş ê gelê kurd radigihînin hemû çîhanê. Sema'yên Welatê Rojê niha tîr nîgar û xeml in. Şêx Seîd, Zîlanê rizgariyê kir û got: "Keştiya Nûh radibe, yên ku jê bimînin dê li bahoz û bagerê biqelîbin." E

Xudawena Azadiyê: Zîlan

...“Yezdan mirovê békêmasî ye, mirov jî yezdanê bikêmasî ye.” Yezdan, çareserî û hêviyê bi hev re tîne bîra mirov. Hêvî bixwebawerbûn e. Hêz ne tenê di warê madî de di warê manewî de jî girîng e. Bi piranî dema ku pirsgerêk çareser bûn, hêz pirtir girîngiya xwe' dide xuyakirin. Sedema ku kes dibin yezdan angî xudewan jî ev e. Lê xudewaniya Hevala Zîlan ne tiştêkî îdealîstî ye. Ev wate jî jiyan û çalakiya wê derketiye. Meşa Hevala Zîlan meşeke xudewani ye. Serok dibêje: “Zîlan fermandar e, em jî fermanber in.” Ev bêşik wateya xudewaniyê



berbiçav dike....Zîlan meşeke bêdawî ye. Ev jî azadîxwazî bi xwe ye.

Hevala Zîlan “Manîfestoya Jiyanê” ye. Manîfestoya şoreşê ye. Rêxistin bemanîfesto nabe, şoreş jî bêyî Zîlan nabe. ... Bi çalakiya Zîlanê hemû nebaşiyên civaka kevn bûne xwelî. Berî her tiştî jina kole bû xwelî û jîna azad vejîya.

Di destana Gilgamêş de dema hevalê Gilgamêş Enkidû dimire, Gilgamêş gelekî li ber dikeve û dest bi doza nemiriyê dike. Ji ber vê yekê jî berê xwe dide yezdanê jiyanê Utnapiştîm. Piştî gelek astengî û xedariyan xwe digihîne. Utnapiştîm pir şaşwaz dibe, ku çawa wî ew qas astengiyên xedar li pey xwe hiştine. Lewre jî cihê

giyayê nemiriyê ji Gilgamêş re dibêje.

Gilgamêş dîsa gelek astengiyên dijwar û xedar li pey xwe dihêle û di bin behrê de xwe digihîne giyayê nemiriyê. Gelekî dilşa dibe. Lê dema ji behrê derdikeve, giyayê nemiriyê ji dest dikeve û marek radihêjê dixwe. Li ser vê yekê Gilgamêş jî dimire.

...Hevala Zîlan jî wekî Gilgamêş doza nemiriyê kiribû. Berî her tiştî Hevala Zîlan ji Serokatîyê hêviyêke bêhempa wergirtibû. Bi qasî hêviyê biryardar bû. Bi biryarê jî bawerî anîbû. Ji ber ku wekî Gilgamêş bi jiyanê azad û serbixwe ve kelijîbû. Wê gotibû: “Ji bo ku ez ji jiyanê û mirovan pir hez dikim, ez vê çalakiyê pêk tînim.” Zîlanê bi çalakiya xwe nemirin deşîfre kir.

Yanî Hevala Zîlan, jiyan jî mirinê şûst. Wê xwe kir wekî liba

genim. Çawa ku liba genim xwe di nav axê de tune dike û peyre bi hezaran simbêlên genim bi xwe re şîn dike, Zîlanê jî wiha kir. Hevala Zîlan ne ji ber xwe ve bû xudewan, bû havêna jiyanê, bû hêviya jiyanê û taca serê mirovahiyê. Zîlan jiyan e. Giyan da Dayika Mezopotamyayê û şîrê jiyanê carekê herikî ji her du pêsîrên wê. Mirovahî jî jê dimije û bi ser xwe ve tê.

Hevala Zîlan ev zeviya jiyanê ku te ji bo me tov kiribû wê ye du salên wê qediyar. Nivê dilê me di nobedariya zeviya ku te çandibû

de bû, nivê dilê me jî di şer de bû. Ev zeviya ku bi ked û baweriya te hatibû afirandin, nebe ku tu xema wê bixwî? Hevala Rewşen û Bermal tim û tim di nobedariya wê de ne. Hevalê Kendal jî avdaniya wê dike.

Hevalê, ka lê binêre êdî rûyê îxaneta navxweyî xwe pir zelal dide nîşan. Lê nobedarên zeviya jiyanê jî roj bi roj zêde dibin; li Hewlêr, ji Dihokê heya Amediyê.... lê binêre. Ref bi ref tene ji welatê bavo Zerdest, ji Çiyayê Zêbilê, ji cem kurê Zalê Zêrîn tî. Gişt bi hev du re tî. Yek dorê nade yê din. Tev bi hev re dibêjin: “Ez jî, ez jî, ez jî...” ber bi te ve dibezin.

Nivîskar bi rêzê: Harbi Soylu
Muhammed Muhamed
Osman Akdağ

“Min ji bo berjewendiyên gelê kurd dest avête çekê. Ji ber vê yekê ez qet ne poşman im. Xemgîniya min ji ber tîkçûna min e. Ez bi dilekî pak diçim ba şehîdên kurdan. Lewre, ji çar milyonî bêhtir kurd wê heyfa min hilînin.”

(Gotinên Şêx Seîd ên berî darvekirinê.)

Wêne: Ji Kovara Nobihare



‘Ez bi dilekî pak wê kurd beyfa

Salvegera dardekirina Şêx Seîd

Dardekirina Şêx Seîd ji aliyê diroknaşên kurd ve tî. Li aliyê din gelê kurd jî li gorî karîna û zanîna xweman ev helwest watedar û hêjatir e. Lewre wekî her dikin, ji yên ku qanûnên gelekî çêdikin, bi hêztir in” rojê ristine. Ev zêmar û helbestên jêrîn nîşaneyên va

AXAO LO!

Ez î çûme şehre Diyarbekirê taviya berf û baranê dixuşxuşand
Desteqiyek ji Babê Elî Heyder (ra) li ser terziya dineqîşand
Axao! Tu neke bi xebera Hecî Hemdî Begê Romî neke; segbabê
Romîya bêbext in, (wê) te bivine şehre Diyarbekirê, bi dar da kin.
Axao, Lo miro! Ez çûme şehre Diyarbekirê, derê dikanê van terziya.
Fermana Babê Elî Heyder Begê Şemseddîn avêtine ustiya.

Axao
Begê
te bil
Axao
ser k
li pêş
Axao
Romî
te bil
Têbî
Bayr
ya N
Dem

n x w e b i l t î n i n

û êgir didome

Şêx Seîd û hevalên wî ye. Şêx Seîd li ber sêdarê gotibû: "Ji çar milyoni bêhtir kurd wê heyfa min hiltin." Di ser vê bûyerê re 70 sal derbas bûn. Roja 30 pûşperê 1996'an bû. Zarokên kurd li dêvla çîrokên terteleyan, êdî li çîrokên qehremaniyê guhdarî dikin. Lê tertele her didomin. Dîsa qehremanî jî her li dar e. Li dijî van terteleyan neviyên Zekiye, Raşan, Bêrivan, Ronahî û Sema niha govenda azadiyê digerin. Keça asîman û keskesorê Sema agir li xwe pêça û bû rengê jî rengên keskesorê. Wê banga banga Keştiya Nûh û niha li ser Çiyayê Araratê tevî pakrewanên din govenda azadiyê digerîne.

Sema Yüce xwe bi êgir şuşt

Piştî şhadeta Sema Yüce em bi dê û bavê wê Zenüre û Sabri Yüce re li ber morga Nexweşxaneya Cerahpasayê der barê jiyana û kesayetiya Sema Yüce de axivîn. Berî ku em pirsên xwe biqedînin bavê Sema bi awayekî dilşewat, lê bi cesareteke gelekî mezin wiha got: "Welat sax be, gelê me sax be, gerilayê serê çiyana sax bin, girtiyên zindanan sax bin. Ez ji hemû gelên Kurdistanê û kesên aştxwaz re serxweşiyê dixwazim. Gelê me û hemû şehîdan silav dikim. Sema ne şehîda me ye, ya welêt e. Ev ne ya ewil ne jî ya paşî ye. Lê ez hêvî dikim ku ev dawî be." Xalê Sabrî digel ol-darbûna xwe jî ji Xwedê gilî û gazincên xwe dikirin. Carinan jî çavên wî hêstir dibariyan. Hêstirên çavên wî yên ku bi jiyana nû hatibûn barkirin, bi ser kincên wî de dihatin xwarê. Li kêleka wî hevala wî yanî dayika Sema Yüce hebû. Di hem-bêza wan de jî Mizgîn. Mizgîn jî xwişka Sema Yüce ya biçûk e. Dema ku Xalê Sabrî ji Xwedê gilî û gazincên xwe dikirin, Mizgîn jî tiliyên xwe rakiribûn û nîşaneya serketinê dikir. Xalê Sabrî bi dilekî fireh û bêtirs serî li dijî zilma Xwedê radikir û bi hestên xwe yên neteweyî wiha bang dida: "Eceba gunehê me çi ye ku Xwedê li me nabe xwedî? Li her kesî xwedî derdikeve, lê li me xwedî dernakeve. Yên ku bi 2 milyon û nîv in xwedî dewlet in, em 40 milyon in lê ne xwedî dewlet in. Çima nerîndiya me li qarşî Xwedê çi ye? Yê ku ji bo Xwedê xwe li erdê dirêj dike kurd e, yê ku Xwedê nas dike kurd e. Eceba xetayê me çi ye? Ji wan re çêdibe lê ji me re çênabe. Em encax dikarin ji insanên xwe bawer bin. Başqê jî tu kesên din bawer nabin." Xalê Sebrî şûn de ji bo ku tu kes wî şaş fêm neke wiha dibêje: "Ez jî baweriya xwe bi Xwedê tinim. Restûlê Ekrem hetanî ku mahcîr nebû, tiştê qezenc nekir. Ew jî bû mahcîr piştê qezenc kir. Em jî dîsa ji Xwedê hêvî dikin ku em jî bibin mahcîr ku Kurdistanê ava bikin."

Li gorî ku bav û diya Sema Yüce dibêjin, di jiyana xwe de miroveke gelekî jêhatî û destve-



Sema Yüce di sala 1971'ê de li gundê Qerxolika Jêrin a Tutaka Agiriyê hatiye dinyayê. Dibistana seretayî, navincî û lîse li Agiriyê xwend. Paşê Fakulteya Sosyolojiyê ya Ortadoğu Teknik Üniversitesi (ODTÜ) li Enqereyê heta pola duyemîn xwendiyê. Di sala 1991'ê de tevî nava refên gerila bûye. Di sala 1992'yan de li navenda Agiriyê di şerê de birîndar bû û kete destê hêzên dewletê. Ji ber endamtiya PKK'ê bi 22 sal û 6 mehan tê cezakirin. Li Girtîgeha Çanakkaleyê di 21'ê adara 1998'an de ji bo protestokirina zilm û zordariya li ser gelê kurd agir bi bedona xwe dixê. Di 17'ê pûşper 1998'an de kete nav refên şehîdên doza azadiyê.

Zenüre li ser bûyerê kevn diyar dike ku rojekê birayê Sema xwestiye para zêde ji xwe re hilde lê Sema li dijî wî derketiye wiha gotiye: "Em hemû heval in di vê malê de, divê herkes wekî hev hilgire."

"Em ji bo eylema Sema li vê derê ne"

Diya Sema Yüce, Zenüre Yüce xwe wekî dayikeke Kurdistanî pêçabû û hêrsa nava dilê xwe bi serbilindî bo me anî zimên û wê jî beriya pêşîn got: "Em niha ji bo eylema Sema li vê derê ne. İnsanên me yên daha qiymetli ev eylema ha çekirin. Mesela Mazlum Doğan, Hayri, Zekiye, Rewşan û gelekên din, tamam di vê riyê de çûn. Ya paşî Sema ye. Daha pey Sema jî wê herin." Zenüre Yüce di heman demê de pêsîra xwe ji bo aştiyê jî vedike û serxwaziye bi van gotinan mahkûm dike: "Êdî em naxwazin van tiştan. Em dixwazin va şerê ha bisekine. Van gencena bes van eyleman bikin. Ji temamê xelkê re çağriya (banga) min heye. Em berxwedana zindanan selam dikin, serwanê serê çiya û Serok Apo selam dikim." Li gorî Zenüre Yüce, Sema ji kesên mazlûm hez dikir. Li gorî wan piştî ku şerê tevgera azadiyê dest pê kiriye wekî her kesî wan jî keça xwe di vê riyê de feda kiriye.

Sema Yüce berî ku biçê ser dilovaniya xwe nameyekê dinivîsîne. Wê di nameya xwe de wasiyetnameya xwe jî diyar kiriye. Bavê Sema Yüce wiha dibêje: "Sema di nameya xwe de digot,

eger cih hebe min li kêleka kalikê min defn bikin. Eger cih nîn be, du heb hevalên şehîd hene, min bibin li rex wandefn bikin. Min jî got Sema li cem kalikê te cih nîn e. Eger izna te hebe ezê te bibim gund. Got, tu zanî min bibe gund. Min jî li gund jê re cih peyda kir." Bavê Sema Yüce piştî van daxuyaniyan bi dilekî şewat got: "Eger nesîp bibe, ezê jê re mezelekî çekim ku ji Kurdistanê re bibe sembol." Berî ku Sema Yüce şehîd bikeve bi sê saetan, diya wê û bavê wê li balê bûne. Li gorî bavê wê Sema nikaribûye bi-axive. Sema, çavê xwe vekirine û wan jê re çî gotibin wê jî bi çavê xwe îşaret daye wan û gotiye tamam.

AZAD ALTUN

im, lewra bilînin'

de kême û zêde hatiye vegotina wê "roja reş" nivîsiye. Bêguman: "Yên ku stranên gelekî çêbestvanên kurd jî hebwesta wê

bi xebera Hecî Hemdê Romî begabê Romiya bêbext in, (wê) Diyarbekirê bi dar da kin. Ez î çûme şehre Diyarbekirê, cotê zabîte Romî, wî kurê kerê vedike nîşane Hemidî.

bi xebera Hecî Hemdî Begê begabê Romiya bêbext in, wê bi dar da kin.

mar (ağut) ji pirtûka Mehmet navê "Kurd û Têkoşina wan Demokratîk (Kürtler ve Ulusal Mücadeleri)" hate wergirtin.

Destana Yûsiv û Zuleyxa

Divê pêşî bibêjim ku di binê Derya Wanê de li derziyekê geran çiqas zor e, lêgerîna nasnameya helbestevan û wêjekarên kurd jî ew qas zor e. Wan kesan bi dehan, sedan heya bi hezaran rûpel nivîs nivîsîne, bi rûpelekê, heya bi rêzekê xwe nedane nasîn. Tenê giraniya wan navê xwe an jî navekî din bi mexlesî xebitandine. Hemine, Selîmê wêjekar û helbestvan jî yek ji wan e?

F. HUSEYN

Ev destana han, dabaşa serpêhatiya "Yûsiv" e, digel beng û serpêhatiya Zuleyxa.

Yûsiv pêxember e û kurê hezretê "Yaqûb pêxember" e û ji welatê Kenanê ne. Ew erd îro Israîlî û Filistînî tê de rûdinin. Di destana me de navê wî "Kenan" e. Navekî Hz. Yaqûb jî "Israîl" e. Çar jin û 12 kurên wî hebûne. Gava ev wiha hate zanîn, daneka me çêtir ronahî dibe.

Yûsiv ji hedê zêdetir bedew, hişdar, hişyar, zana û xwedî qabiliyet bûye. Heçî Hz. Yaqûb e, ji hemû weledên xwe zêdetir ji Yûsiv hez dike. Ji van sedeman, hê di zarotiya wî de, 10 birayên wî jê çavnebarî û kumreşiyê dikin û dixwazin wî ji holê rakin. Her 10 bira li ser kuştina wî li hevdu nayên. Paşî bi lêkhatî dibin û wî davêjine binê bîreke çolê. Gava difetiline mal, ji bavê xwe re "Yûsivê te guran xwar" dibêjin. Piştî domekekê, bazirganek li ser wê bîrê datîne. Bi av derxistinê re Yûsiv derdikeve û dema çûnê bi xwe re dibin. Bira bi vê yekê dihesin. Digihîjine wî bazirganî û bi koletî difiroşinê. Bazirgan jî Yusiv dibe di bazara Misirê de difiroşe.

Zuleyxaya keça Teymûs Şah, di xewna xwe de Yûsiv dibîne û lê bengî dibe. Yûsiv bi wê xortanî û bedewiya xwe, şiday qewîtî lê dike ku "Şaş nekî. Ez ezîzê Misirê me" dibêje. Teymûs Şah bi tu awayî nikare keça xwe ji wê bengê rizgar bike. Digel wê mesafa dûr bi pêwîstî wan digihîjine hevdu. Di çûna gerdekê de Zuleyxa pê dihesê ku Yûsiv ne ev e. Ezîz jî pê dihesê ku Zuleyxa jê re nabe. Her du jî pê dihesin ku di vî karî de razek heye. Lê nikarin wê razê bipişkêvin. Her du jî hevdu xweş dibînin, bê diliya hev nakin. Zuleyxa, bi geşt û neçîran dembûriya xwe pêk tîne. Rojekê di bazara koleyan de rastî firotîna Yûsivê di xewnê de dîtî tê. Bi bez digihîje mal û bi ezîz dide kirîn. Piştî rojan Zuleyxa bi Yûsiv re îlana benga xwe dike. Lê Yûsiv bi tu awayî xwe bi destê wê ve bernade. Ji şewata dilê xwe Zuleyxa, bêbexteyekê li Yûsiv dike û wî davêjine zindanê. Piştî heft salan jî zindanê derdikeve. Dema ku Yûsiv di zindanê de ye ezîz dimire. Yûsiv çawan derdikeve dikeve cihê wî, dibe ezîzê (serekwezîr) Misirê û bi

Zuleyxa re dizewice. Peywira ezîziyê dema dipejirîne, bêrawestan sîloyan dizazîne û dexil embar dike. Piştî çend salan xelayeke dûvedirêj radiibe. Di sala Yûsiv de gelê Misirê bi hêsanî ji xelayê rizgar dibe. Xela bandorê li Kenanê jî dike. Her deh bira ji bo peydakirina dexil diçine ber derê ambaran û Yûsiv wan dinase. Lê ew Yûsiv nana-

bi dehan, sedan heya bi hezaran rûpel nivîs nivîsîne, bi rûpelekê, heya bi rêzekê xwe nedane nasîn. Tenê giraniya wan navê xwe an jî navekî din bi mexlesî xebitandine. Hemine, Selîmê wêjekar û helbestevan jî yek ji wan e. Hîç qaîdeyên hevriyên xwe ne rûxandiye. Di van derfetên teng de, me çî kariye bi dest bixin, emê kurtiya wê pêşkêş bi-

agahdar bikin bextiyar diben û wêjeya me jî pê zengîn û şah dibe.

Dibêjin Ehmedê Xanî jî Destana Yûsiv û Zuleyxa nivîsiye. Ew jî bi dest me neketiye. Jixwe Berhemên me yên di dîroka dûr û nêzik de hatine amadekirin û nivîsandin, ji devê guh bi dest me neketine. Berhemên nivîsandî yên gihîştine destê me giraniya wan bi elfabeya erebî û destnivîs in. Ji bo ku di destê dagirkeran de neyne dêrizandin di cihên tenha de hatine veşartin. Beşek jê mişkan xwariye, beşek jî avê lêdaye, heşifandiye an jî hêmî kiriye û rizandiye. Hemine ku yên zinde jî tê de derdikevin. Hê jî roj bi roj dêrizandina wan berhemên zêde dike. Heya niha bi awayekî ji dil û bi rêkûpêk me dest navêtiye rizgarkirina van berhemên. Rizgariya berhemên û ya candaran ne ji hev in. Ya berhemên nivîsandî bi çapandinê ye. Di dîtin û zanîna me de, gava gelek û neteweyek alaza azadî û serxwebûnê bike, divê pêşî dest bavêje wêjeya xwe û berhemên xwe yên wêjeyî. Gelo ew dem ne hatiye; ku nehatiye dê kengî bê? Zinhar, hevoka "Hê dem ne hatiye" nekin bersiva van pirsan. Lewre em gelek dereng mane.

Destana Yûsiv û Zuleyxa (ev berhem), ji ber sê destnivîsan, berî pênc salan, me ji tîpên erebî fetilande tîpên latînî û bi zor îsal hate çapandin. Li ber derê sedsala 21'ê bi vê çûnê em nagihîjne tu kaman ango mirazan. Gelo sedem çî çapandina vê, ew qas derengî bû? Ji ber tengasiya firotinê, weşanxaneyan xwe nedidane ber. Paşî Enstîtuya Kurdî ya li Stenbolê ev berhema dîrokî ya nemir hilda destê xwe û çapand. Heger di domekek normal de, ev berhem bikare çapa dudan li dar bixe, dê hêviya weşanxaneyan gur bibe. Di vê tentêlê de, heger pûçûk jî be dê derfêkî li çapandina wêja kurdî vebe. Heger keysek wiha bihafire; Divê bêrawestan em dest bavêjin berhemên xwe yên destnivîs. Heger piçek jî ji ber mişkan flitîbe û dest me bikeve, biçapînin. Ku keysek wiha neafire, divê em li afirandina wê bixebitin.

Di baweriya min de, heya em wêjeya xwe ya kevin ranexine ber çavan, dest bi ya nû kirin çewt e. Lewre divê wêjeya nû li ser xîm û binyata ya kevin bê avakirin. Paşî bi kincên nû bê xemilandin. Ev şîrove, ji bo çand û wêjeya "devkî" ye jî.



Selîm, destana Yûsiv û Zuleyxa nivîsiye. Ev berhemên me yên di dîroka dûr û nêzik de hatine amadekirin û nivîsandin, ji devê guh bi dest me neketine. Berhemên nivîsandî yên gihîştine destê me giraniya wan bi elfabeya erebî û destnivîs in. Ji bo ku di destê dagirkeran de neyne dêrizandin di cihên tenha de hatine veşartin. Beşek jê mişkan xwariye, beşek jî avê lêdaye, heşifandiye an jî hêmî kiriye û rizandiye. Hemine ku yên zinde jî tê de derdikevin. Hê jî roj bi roj dêrizandina wan berhemên zêde dike. Heya niha bi awayekî ji dil û bi rêkûpêk me dest navêtiye rizgarkirina van berhemên. Rizgariya berhemên û ya candaran ne ji hev in. Ya berhemên nivîsandî bi çapandinê ye. Di dîtin û zanîna me de, gava gelek û neteweyek alaza azadî û serxwebûnê bike, divê pêşî dest bavêje wêjeya xwe û berhemên xwe yên wêjeyî. Gelo ew dem ne hatiye; ku nehatiye dê kengî bê? Zinhar, hevoka "Hê dem ne hatiye" nekin bersiva van pirsan. Lewre em gelek dereng mane.

sin û di rûyê wî de "Em 12 bira bûn. Bi navê Yûsiv birayekî me guran xwar. Bi navê Binyamîn birayekî me maye, li mal li cem bavê me ye. Vaye em deh jî li vir in" dibêjin. Bi kurtasi paşî Yûsiv dinasin. Wisa şermezar dibin ku mirinê jî xwe re dixwazin. Lê bi dest wan nakeve...

Selîm, kî ye û kengî ev pirtûka hêja nivîsiye?

Divê pêşî bibêjim ku di binê Derya Wanê de li derziyekê geran çiqas zor e, lêgerîna nasnameya helbestvan û wêjekarên Kurd jî ew qas zor e. Wan kesan

kin: Her çiqas Qanatê Kurdo navê wî "Selîm Sulêmane" dibêje. Min nekarî bi tu awayî vê yekê bidim teyîdkirin. Navê vî zafî "Selîm" e. Bi xwe jî di dawiya vê destanê de ev nav bi kar aniye û wiha "Wehab û Kerîm û hem Rehîmî, Mehrûm nekey ji xwe Selîm" dibêje. Ji herêma Xizanê (Hizan) ye. Seydatiya medresa Mîr Şerefê mîrê Hizanê kiriye. Heya nêzikî dawiya sedsala 18'an li dinê bûye. Di wan navan re ev destana hêja hildaye pênuşê. Ji bilî vê destanê dabaşa gelek afirnekên(berhem) wî tê kirin. Lê heya niha bi dest me ne ketine. Heger yên dîtî hebin û me jî pê

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 27 pûşper 1998 şemî:

Panel (Înstîtuya Kurdî) "Serhildana Şêx Seîd"

Birêvebir: Nîjad Yaruk (Endamê Rêveberiya Înstîtuya Kurdî)

Beşdar: Îsmail Gôldaş (Lêkolînvan-Nivîskar)

Kerem Soylu (Endamê Rêveberiya Înstîtuya Kurdî, saet:14.30

● 28 pûşper 1998 yekşem:

Konsera Koma Rojhilat

Dîa.....Helbest.....Teatra Jiyana Nû.....Pêşangeha Gulên Mezrabotan.....

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li NÇM'ya İzmirê

● 27 pûşper 1998 şemî: "Kevneşopiya Xwarinên Kurdî"

Konsera Koma Vengê Sodirî, saet:17.00

● 28 pûşper yekşem: Konsera Koma Vengê Sodirî

Seansa Yekem:15.00. Seansa Duwem: 18.00

BEKSAV

● 27 pûşper 1998 şemî: Konsera Şafağın Türküsü, saet:18.00

● 28 pûşper 1998 yekşem: Film: "Salcının Ölümü" (Mirina Firoşker),

derhêner: Volker Schlandorf, saet:15.00

Nivîskar-helbestvan Nihat Behram:

'Ji 16 saliya min ta îro zilm serdest e'

Nihat Behram, qala ser-pêhatiyên xwe bi Deniz Gezmiş û Sinan Cemgil re, girtina xwe, jiyana sirgûnê, rewşa duh û îro ya Tirkîyeyê kir.



Pirtûka Behram a bi navê 'Darağıcda Üç Fidan' ku li ser Deniz, Mahir û Sinan nivîsiye piştî 22 salan serbest bû.

Nivîskar û helbestvan Nihat Behram, roja 23'ê pûşperê li "Cumhuriyet Kitap Kulübü"yê gotûbêjek li dar xist û pişt re jî pirtûkên xwe yê helbestan ji bo mêvanan îmze kir. Gotûbêjê jî du beşan pêk hat. Di beşa yekem de helbestvan, qala ser-pêhatiyên xwe bi Deniz Gezmiş û Sinan Cemgil re, girtina xwe, jiyana sirgûnê, rewşa duh û îro ya Tirkîyeyê û li ser helbest û rexnegirîya helbestê kir.

Nihat Behram di destpêka sohbetê xwe de bilêv kir ku ji sala 1980'yê heta dawiya 1996'an mecbûr maye ku 17 salan ji welatê xwe dûr bikeve. Behram wiha got: "Di jiyana xwe de rojek be jî ez bi kêrî dewletê nehatime. Ji 16 saliya xwe ta îro min dewleteke ku lê zilm serdest e dît." Helbestvan gotinên xwe wiha domand: "Bêguman Tirkîye bi pir-rengiya xwe, di cihanê de erdnigariya herî xweşik e. Lê mixabin berê jî û îro jî kesên ku rayedariya dewletê kirine û dikin, ne layiqî vê xweşikahiyê ne." Behram, li ser helbestvanî û xebatên xwe jî got ku ji bo wî hebûna jiyana helbestê û bi romanê re jî li derve naskirin û heskirina wî çêbûye.

Her wiha wî got ku heta niha 10 pirtûkên wî yê helbestan çap bûne û heta çend mehên din wê hejmara pirtûk-romanên wî bibin 10. Helbestvan Nihat Behram ragihand ku ji bo wî, sosyalîzm, biratî, evîn û nirxên insanî; ramanên Pablo Nerûda, Nazım Hikmet û Ahmed Arif, hestên pîroz in û tu car ew dê dev ji van nirxên payebilind bernede. Her wiha Behram, rexneyên tûj li çapemeniya çepgir girtin û wiha got: "Piştî 17 salan qedexebûna li ser min rabû û piştî 22 salan jî pirtûka min a bi navê 'Darağıcda Üç Fidan' serbest bû. Sed mixabin ji çapemeniya rengîn kesên wekî Ali Kırca û Doğan


Hızlan cih dan vê bûyerê, lê ji çapemeniya çepgir û sosyalîst re ev bûyer şayanî weşanê nehat dît. Qene levzek jî nenivîsim"

Di beşa pirs û bersivan de Nihat Behram wiha got: "Min bi birayê xwe Ataoğlu Behramoğlu re kovara 'Halkın Dostları' derxist. Ji bo ku min li ser Deniz Gezmiş û hevalên wî helbest nivîsîn ketim girtûgehê. Deniz ji Lîseyê Haydarpaşayê, Sinan Cemgil jî ji taxê, hevalên min bûn. Ez ji vê civakê hem hez dikim û hem jî nefret dikim. Nefretê min; ji ber ku hûn li derve sirgûn in lê ew kesên ku dibin sedema van yekan li ser kar in. Li ser helbesta salên 90'î ez çî difikirim? Ji bo min ne girîng e ku ez mirovan li gorî temenê wan û di kîjan salê de hatine dinê, binirxînim. Mesela ez di riyeke sosyalîst de dimeşim û li gorî vê yekê dinivîsim"

Nihat Behram pirsê bi rengê "Di hesabpîrsîna îdeolojîk de rola helbestê çî ye?" wiha bersivand: "Mirov zû bi zû Ruhî Su ji bir nake, lê 'pop'van an jî 'rock'vanek ku di hefteyekê de Tirkîyeyê sero-bino dike, tu dibînî ku hefteya din tê jibîrkirin. Kesê ku herî zêde ji helbestê fêhm dibe Ahmed Arif e. Ew bi helbestên xwe hesabê '33 Gule'yê distîne. Mixabin kesên ku ji helbestê fêhm nakin, wekî qaşo rexnegir Mehmet Eldoğan ku bi salan e antolojiya helbest û helbestvanan dinivîse lê cih nedaye û nade Ahmed Arif, Nazım Hikmet û Enver Gökçe ku 7 sal ji bo ku helbest nivîsiye di girtûgehê de peytîyaye. Ev pîrgirêk li çar aliyê cihanê heye, wekî mînak Garcia Lorca, bi gulebaranê Franco Adam daye kuştin. Çî kiriyê, sîcê Garcia Lorca çî ye? Rebeno bi tenê helbestên evîne nivîsîne"

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

TÎŞK



Lec û ciniyî

LERZAN JANDÎL

Bêguman her çîyo ke lecî ver de vindeno û angorê armanc û îdeolojiyê lecî niyo, hetê lecî ra êno pelexnayene û rijnayene. Miyanê mantiqê lecî de na şikîna bêro famkerdene. Çimke armancê lecî, cirestena yew hedefî ya. Sebetake lecî bişkiyo, ke bireso nê armancê xo, ganî verê xo raşt bikero. Seba raştkerdene jî pelexnayen û rijnayene 'normal' a.

Lewan de her kes û her çî zerar vînenê. Mordemî, şarî, mal dawar, dar û ber, awe, hewa, leşkerî ebi kilmîye kam û çî beno wa bibo, eke nê kes û çiyî hardê lecî ser ro yê, lecî ra, angorê mantiqê lecî, angorê na 'normaliyê' zerar jî vînenê.

Lecan de tayê çî benê, ke ne teyna dînan, xo ser ro famkerdena dînan jî bênumkun a. Ma vacimê, zerar diyena çî û kesane ke dîrek zerê yan jî kaleka lecî de niyê. Yan jî rijnayena, qedenayena çîyanê ke, lecî ra dimê ihtiyaciya lekerdoxan ere ci esta.

La belê lecan de tayê çî estê, ke mordem hard û asmên ra vecîno teber. Lingê mordemî zeleqînê hard ra. No jî tecavuzê cîniya hetanî çênekan kerdene û kîştina domanan a.

Lecan de tecavuz çiyêde newe niyo. Aybê mordematiyê ebi hezar seran o. Dîroke de na derheq de numuneyî bê hemd zaf estê. Ma nînan ser ro nêvindeme.

La belê dramê cîniyanî Koreyayê û Çîniyê ke hetê leşkeranê Japonya ra amê tecavuz kerdene, huna jî aktuel o. Dramê cîniyanê Yugoslavyaya kane huna vîra mordematiye ra nêşîyo. Ser ro êno qesekerdene û nivîsnayene.

Ma dramê cîniyanê welatê ma? Leco ke welatê ma da beno, zê lecanê bînan zeraro girsêrî dano-cîniyan. Arman û îdeolojiyê nê lecî jî zê lecanê bînanê koledariye rijnayen û pelexnayena qij, pîl, cênî camêrd, doman xort şarê ma; dar û ber, kemer kuç, ko û raşte welat ma wa. Û zerê nê lecê qilerîne de zeraro girsî jî cîniyê ma vînene. Derba tewr girse, nê kesan miyan de zaf biyena 'qorucuyan' a. Nê ne leşkerê Japonya yê, ne jî, zê Yugoslavya de, şikîne ferqa dîni bikere mane.

Ez bawar kena na mesela de faktoro esas ne dîn o, ne şarêde bîni biyena, ne jî teyna xo ser ra dişmentî ya. Bingê naye de angorê bawariya mi, waştina wayirbiyena camêrdî ya. Camêrdî ke waşt bibo wayîr û lec de jî na îmkanê diyê, îndî kes nêşikîno ê bîvindarno.

Eke serde jî kerdana dê de rê kare mende, kes nêzî nêbî, ceza nêde ci, serbest mend, o taw kesê niyanênî cesaret gêne û meselaya tecavuzî zê meselayêde îstîsna nêmanena, zê welatanê bîna, bena biyenêde rojanîye.

Naca de ganî her kes wayîrê cîniyan, têkoşîna dînan biveciyo. Înan teyna meverdo. Ha komalê sîvîlî, ha kesê xoserî, ha roşnavîrî, ha organizasyonê siyasî, ganî herkes na mesela ser ro bifikiyo û hemverê naye têkoşinanê alternatîfa bîvîno û pratîkte jî bixebetno. Ebi na qeyde mordem şikîno, lecê qilerînupe miyan de barê cîniyanteyê şenik şivik bikero.

Çend mînak ji govend û dûrikên Botanê

Di govendên Botan de amûrên mûzîkê tune ne. Heke hebin jî pir kêr in. Di dawetên Botan de çend kesên serê dilanê dikişînin ew dest pê dikin û govendê geş dikin. Di geşkirina dilanê de kesên serkêşiya dilanê dikin, ew dûrika dibêjin. Bi dû wan de jî mirovên di govendê de mîna "koro" yê bi hev re li wan vedigerînin.

Ji govendên Botanê navên çendikan ev in: 'Hilavetîn', 'Tilîk', 'Navhinçî', 'Sêgavî' û 'Bablekan' wekî çend listikên govendan in.

Her dûrik li gorî meqamekî govendê hatiye çêkirin û tê gotin. Bi vî rengî jî folklorê Botan bi giraniya xwe, bandora xwe li ser çanda dewlemend a kurd daye nîşan. Di van govendan de bi gelemperî dûrik li ser dilan in. Dîsa çawa ku di mînakên jêrê de jî eşkere ye, şerê eşirtî û mîrxasiya Egîtan, tîkiliya mirovahiyê û nêzikbûna xwezatê (siruşt) her dem di dûrikan de derketiye pêş.

Hey kûr e

Hey kûr e kûr e
Gêra Mûradê kûr e
Wê tê de masiyê hûr e
Gêra Mûradê kûr e
Bûka me bêqûsûr e
Gêra Mûrdanê kûr e

Hey teng e teng e teng e
Gêra Mûradê teng e
Wê tê de masiyê reng e
Gêra Mûradê teng e
Bûka me bi nav û deng e
Gêra Mûrdanê teng e

Hey tijî tijî tijî
Gêra Mûradê tijî
Wê tê de masiyê bejî
Gêra Mûradê tijî
Bûkaniya min û te jî
Gêra Mûradê tijî
Bûkaniya min û te jî
Wekî Zapê tijî
Gernasên bi dengîn.

Lo mîro



Li mîro tê tîlanê
Lo bego tê ji tîlanê
Lo mîr şûr girêda
Danî li ber kolanê
Lo mîro şûr girêda ser kolanê
Heyfa lawê Xerzan
Maye li ber baranê

Heyfa xortê Xerzan
Maye li ber baranê
Lo mîro tê ji zewqê yo
Lo mîro şûr girêda
Danî li ser newqê yo
Heyfa lawê xerzan
Maye li ber berfê yo

Heyfa xortê xerzan
Maye li ber berfê yo
Lo mîro tê ji Dihokê
Lo bego tê ji Dihokê
Lo mîro şûr girêda
Danî li ser keyfokê
Heyfa lawê Xerzan
Maye li ber teyrokê.

Nalbendo

Nalbendo nala çêke
Solbendo sola çêke
Hûr hûr bizmara lêke
Êvar e min vê rêke
Par keç bû îsal bûk e

Nalbendo nal mezin o
Solbendo sol mezin o
Serê nalî bazino
Par keç bû îsal jin o

Nalbendo nal radayo
Solbendo sol radayo
Serê nalî badayo
Binê nalî badayo
Par keç bû îsal daw o

Berhevkar: GIRTÎGEHA SEMSÛRE

Dûrikên kar, dawet û zarokan

Tu war nema min lê danenî
Tu kanî neman min jê av nehanî
Nizanim şivanê min xwe jî
Kîjan hewdikê û kîjan delavî tilaqa xwe
hilanî

Hemberik û zemberik
cawe çû zozanan
Xwariye pelê qîzwana
Şîr ketiye qeştê guhana

Şivanan pezê xwe rakirin
Gar û fesal wenda kirin
Min da ser şopa şivanan
Şopa şivanan xwe wenda kirin

Derdê dilan derdekî no ye
Ne bi şev e ne bi ro ye
Wek tu êgir berdî ser çilo ye

Kela Dêrikê bi mûtik e
Xezal pêda tîyî likilik e
Bi ser xwe da berdaye
Qorik zêr î yek findiq e

Hamo tê ji bizinan
Dev dikê kav û kizinan

Hemo tê ji cotê
Ji bona înciya kevokê

Li mi gir gir û heradê
Ev genimê hatiye
Li ber çimînê û seradê

Deriyê me di deriyê we da
Devê derî di qulbê da
Dilê me di keçka we da
Me xwest û bavê neda

Dingir dingir dingir lê
Sebra çê, debra beriyê
Masîcankê dor golê
Ava bîra kufurlê

(ev stran jî bo zarokan bihewînin 'di xew kin' tê gotin.)

Herêma melîne xweş melîn e
Te kok gir dargerîn e
Rewtên pala hewl tîne
Cuherê pala rengîn e
(ev stran jî aliyê paleyên ku mazî diçimînin
tê gotin)

Diya bûkê nivînan hiltîne

Derziya bûkê li şwînê (şûn) dimîne
Hestrê xwînê dibarîne

Çûka zerê li hemberê
Hejîra nexwe, henaran nexwe
Her ser Kanîka Dêran tîr av vexwe
Hey hela hela hû û û...
(ev metelok jî bo parastina zevîyan tê
gotin.)

Hatin te yo hatin te yo
Bikin kar û barê xwe yo
Şîn û girî bîfêde yo
(jî aliyê derdora bûkê ve tê gotin.)

Ha' li dîba ha li dîba
Nexşê hûr li heqîba
Gewrê megrî tu nare nav xerîban
(stran jî aliyê dê û lêzimên bûkê ve tê gotin)

Çi zinarê sî mezin o
Koma xorta xwe da bino
Wî yê şoqê xwe re
Diran zêrîn birê miho
(stran jî aliyê lêzimên zavê ve tê gotin)

Şivan got min pez çêrand

Min fikand û wî çîrpand
û me hêva yek şevê bir ava
û ez raketim û ez rabûm roj dera
dera pêzê çî halê çî

Dotmamê gotiye pismamo serçav kesk o
Min yek kîriye tû avê li destko
Pismam gotiye rû bi xwînê
Min yek hanî tu mizgînê

Di cî de cî de hewşa apê hecî de
Binê mêva kuncî de
Mêva kuncî xera bû
Tev şûrika şerad bû
Destê mirov şîne bû
Çavê mirov bar nebû

Ber derikê mala bavê bûkê
Taht tê de yo
Kulava raxe bi qato qato
Bûkê megrî berbû hato

Mala bavê bûkê di kortê da
Petêx sor dilê me de
Bûka me wek
Şuşa li ser lampê yo

Berhevkar: FIKRET NALÇEXANÎ

Li ser kurdan pirtûkeke japonî Rûyê din ê Tirkîyeyê

Li vir em dixwazin çêlî pirtûkê "Tirkîyeya ku rûyekî wê yên din heye" bikin. Nivîskarê wê pirtûkê Prof. Gouici Kojima yekemîn zanyarê japonî ye ku digel lêkolînên der barê civaka kurd de, li ser zimanê kurdî (kurmançî û kirmançî) lêkolîneke berfireh kiriye.

Wî ji sala 1977'an ve 17 salan gelek caran serî li Tirkîyeyê daye û serdanên lêkolînî li seranserê Tirkîyeyê pêk anîne. Her wiha lêgerînên taybet li ser hemû zimanên ku di nav sînorên Tirkîyeyê de bi wan tê axivîn; tirkî, lazî, asûr, kurdî (kurmançî, kirmançî) û hwd. pêk anîne. Lêkolîner dide pirtûka xwe de dide zanîn ku wî di dema lêkolînê de gelek tengasî kişandiyê, lewre dewletê gera wî li nav Tirkîyeyê asteng kiriye. Ev pirtûka navborî di sala 1991'ê de li Japonyayê hatiye çapkirin. Dema ku Prof. Kojima xebat kiriye, salên 1980'yî ango heyama cuntayê bûye. Ne diwar e ku mirov astengên ku rejîmê derxistine pêşberî wî texmîn bike. Bi taybetî dema wî li Dêrsimê xebat kiriye, ji ber ku bajar di bin desthilatdariya rêveberiya ne-asayî de ye, gelek caran ji hêla leşkeran ve ew hatiye girtin. Ji ber vê yekê ew bêgav maye ku dev ji xebata xwe ya lêkolînî berde. Digei vê yekê jî wî wekî zimanzanekî xebata xwe biriyê serî.

Heke yek dixwaze lêkolîneke zimanzanî bike, ne pêkan e, ku xwe ji dahûrandina çand û civakê bide alî, lewre ew mijar gîş di nava hev de ne û bi hev re têkildar in. Prof. Kojima bi taybetî li ser civaka kir-

manç û alevî û zimanê wan xebitiye. Xebatên wî de di zanîngeha Fransayê de ku ew jî mamosteyê wê ye, wekî tezeke zan-yarî bihata pejirandin. Paşê Balyozê Tirkîyeyê yê Fransayê bi xebatên profesorê japonî ku bi kurdî dipeyive hesiyaye, piştî wê jî peywirdarên wezîrê karê derve pê hesiyan. Ji bo hikûmeta tirk ku dibêje "li welatê me yî mezin ji bilî tirkî ziman nîn e" jî xeynî serêşiyê ne tiştêk bû.

Peywirdarekî wezaretê karê derve yê tirk ji Kojima re got: "Teza we dê bandora bombeyekê bike, dê bibe sedema gelek sergêjiyan li welatê me, lewre jî divê ew bê bincil-kirin." Prof. Kojima li ser gotina xwe sor bû û da zanîn ku ew ne alîkarê tu rêxistinê ye, xebata wî bi tevahî xebateke zimanzanî û zanistî ye. Piştê jî wî pêşniyaza bincilkirina xebata xwe nepejirand. Tevî ku peywirdarê tirk gelekî xwe eşand

da ku wî bide bawer kirin, lê nekarî ramana wî biguherîne.

Li ser vê yekê wezaretê karê derve yê tirk dest avête rêbazêke din.

Wezaretê destûrnameyek da Profesore Japonî da ku ew li Dêrsim û Amedê lêkolînên zimanzanî bike, lê profesorekî ciwan ê tirk wekî arîkar dan cem wî. Wî kesî jî xwe re "pisporê zimanzanîyê" digot. Lê dema wan dest bi gera ya li nav wan her du bajarên gundên wan bajarên kir,

Prof. Kojima dît ku profesore tirk ji wî re nabe alîkar, berevajî vê yekê destkariyê di xebatên wî de dike û her tim lê dixebite ku

xebata wî asteng bike. Piştê Prof. Gouici Kojima pê derxist ku ew kes ne profesor e, lê zilamê rêxistina saloxdanê (MIT) ye. Prof. Kojima bi gelek dijwariyan re rû bi rû ma, bi şeweyekî xebata xwe bir serî û vegeriya Enqereyê.

Piştî ku gihîştî Enqereyê tavilê ji Wezaretê Karê Derve yê Tirkîyeyê gazî wî kirin, peywirdarekî payberz ê wezaretê ji Prof. Kojima re got: "Niha divê tu vê kaxizê îmze bikî." Li ser kaxizê wiha hatibû nivîsandin: "Kurdî ne zimanekî têkûz e, ji ber vê yekê jî bo perwerdehiyê bi kêr nayê." Kojima tê derxist ku ew dê vê kaxizê jî bo înkarkirina zimanê kurdî wekî delil bi kar binin û bidin zanîn ku tirkî tekane zimanê ku ji bo perwerdehiyê bi kêr tê, lewre jî wî kaxiz îmze nekir û got: "Mixabin li gorî lêkolînên min kurdî zimanek e, ez nikarim bibêjim ji bo perwerdehiyê bi kêr nayê." Li ser vê helwestê, piştî demeke kurt wî ji heman wezaretê fermanameyek (talimat) wergirt, tê de dihat xwestin ku divê ew tavilê ji Tirkîyeyê derkeve. Careke din jî hîç rê nedan ku ew vegere Tirkîyeyê.

Tirkîye jî hêla gelek mirovên japonî ve wekî welatekî xweşîk û dost tê zanîn. Her sal û her gav gelek tûristên japonî tîrên Tirkîyeyê. Lê ew bi tenê serî li Rojava didin. Haya gelek mirovên japonî ji hebûna kurdan jî nîn e. Belkî pirtûka Prof. Kojima jî li Japonyayê dengêkî mezin veneda, lê di warê kêşeya kurd a li Tirkîyeyê de serwestbûnek pêk anî.

SERWISA ÇANDÊ



Pirtûka 'Rûyê din ê Tirkîyeyê'

Cîhana kor kerende

MEDENÎ FERHO



Çend mirov.....Gelo çend mirov, dema ji xew hişyar dibin, bêyî ku bawîş kin, di bûyer û pêhatiyên roja bûrî diramin û bi destpêka rojê re li ser bûyer û pêhatiyên li ber qewamê mijûl dibin? Rastî, piştî destpêka şampiyonetiya futbolê ya cîhanê ku di rewşeke pîr politîk de li Fransa dest pêkir û vir de, ji bo min bersiva pîrsê ketiyê nava tevneperîka qul û qewêrên hêrikan, ku têhnika rojê nabîne. Ewqasî gemarî, ewqasî lewitî û di nava kirêtiya şemazarî de hatiye hûnandin, dil kewitî, kezêb herhilî, hest sofî kirî, xewn û xeyal şikestî bûye. Li peyven min nenêrin û nebêjin, nivîskarê û hêviya şikestî tiştêkî nabêje hevûdin. Digel we diramin, lê belê digel we nêzikî bûyer û pêhatiyên nabim. Bêguman hûn jî wilo ne!

Ku murê mirovan şikestî, hêvî xewna şevê ye. Lewre dibêjim, mirovan di paşerojên cîhanê mijûl dibin, di van rojên ku cîhanê berê xwe daye tep-repa goka di nava bîst û çar piyên çeleng de, li ser zurçika ku bi meqes û çerxa dawîya sedsala bîstan bi delalî hatiye birîn, dibêze, kul û derd û meraza li serê cemawerê bindest raselîtiye ji ber qîrên û awazeke dilojarêyî

dipekê ber palet û şarapnêlek nîjadperestî. Dilê dayikan bûye goka meşînî, li ber palet û şarapnêlan dixindire. Pêtên agirê bedena Sema Yûce û xort û dotên din yên Kurdan an jî mêjiyê hestîkê reşîkên Afrîkayê ku ji birçibûna bêzarî û neçarî di nava nalên û gevzeke mirinê de ne, qet nayêne bîra kesî.

Gok dizivire....Bi sedhezaran çav zur dikin, gokê dişopinîn, ji ber lingê kîjan spomendê çeleng çû ber lingê kîjan spomendê çeleng....Pîpîka hakem çima lê da, çima qarta sor nîşanî wî spomendî da. Ev penaltî bû, ev faul bû û hwd. Gok dizivire....Bi sed hezaran deng di nava kela dil de difûre û diqîre....Çi bûye, çi qewimiye! Spomendek ket, gokê tora qalê hejand... Bi sed hezaran mirov radibe ser piyan, bi sed hezaran mirov amade ye ku cîhanê di ser serê xwe re, wekî serad û bêjînga xêr û gunehan bihejin. Gok dizivire....Lê belê ne birîna xedar ku di serdilkê jîyanê de bi xwîn bûye û ne kunêra birçibûna bi sed hezaran reşîkî derman bûye û ne qarên û waweyla hindikahiyan dikevê kerika guhên binbar û berpîrsên jîyanê.

We bihiştîye gelo; ku bi salane sazîyên di bin bask û perên Amerîkayê de li cîhana sêyemîn, bi amanca û desteka xizantiyê dermanên şewrbûnê ango qutkirina zarokan didine jinan. Xwedêgiravî dermanê ta û ba yeXwedêgiravî dermanê êş û elema hinavê mirovan çareser dike ye. Mixabin ew dermanê ku tê dayin nexweşiya zeltan(kanser) jî çêdike.

Hûn dizanin çima vî dermanî didin ku şeniya nîşê mirovên cîhana sêyemîn zêde nebin? Ji bo paşerojan ku pêlên koçberiyê ber bi Amerîkayê

ve neçin. Û doh (21.pûşper.98) di navbera Amerîka û Îranê de maça futbolê hebû. Cîhanê dev ji kar û barê xwe berdabû û li vê maçê temaşe dikir.

Maç ketibû radeya politîk ya herî bilind. Û Amerîka, dewleta Îranê bi destek kirina grubên terorîst tawanbar dike. Amerîka ku tenê bi derman û şirûbê, bi sed hezaran mirovî, zarokî, gorî paşerojên xwe dike... Bi sed hezaran dilê jinan dike bin-piyê xwe....

Amerîka ku di şerê Wîetnam de ji bo leşkerên xwe yên firar gaza "sarîn" bi kar dianî...Amerîka ku ji bo erka desthilatdariya xwe ya cîhanê, di Rojhilata Navîn de destekê dide dewleta Tirk ku di pazdeh salan de çar hezar gundê Kurdan vala kirine, cografîya Kurdistanê sofî kiriye, kuştin û talaqreşî, dirutî û zikreşî kiriye kar û barê xwe....Amerîka ku destekê dide dîktatorên cîhanê teva....Amerîka ku destên wê di şerên dawîya sedsala bîstan teva de heye, Îranê, terorîst dibîne. Lê belê Tirkîye û îsrailê terorîst nabîne û xwe terorîstê herî mezin nahesibîne.

Bill Clinton li ber telewîzyonê li maçê temaşe dikir. Îran bi serket. Gelo Kilintin wê Îranê bêhtir tawanbar neke! Hêviyên rojava bi Hatemî re hebûn, gelo Kilintin ew hêvî jî wîndî nekirine? Gok girover e, ola gotin û livandina girover nîn e. Ev gotineke pêşiyê Kurdan e. Gok girover bû, xindirî, çû hat û du caran tora kortika Saraya Spî hejand. Hatemî golên xwe avêtin, dora Kilintin e....

Di vê cîhana kor û kerende de, kî çi dike ji wan re dimîne. Pêşiyên kurdan dibêjin, kê kir jê re ma, kê nekîr pêre ma.

Cezayê bêşûc

Dîsan li nav bajarê Nisêbînê qîr û qiyamet bû. Dê weledê xwe avêtibû. Dewlet bi hemû hêza xwe; tanq, zîl û zerîpoşan, leşker, polîs, tîmên taybet û cerdevanan ketibû nava sûk, kolan û sîkankên bajarê serhildanê, bajarê Nisêbînê. Gel piştî ku sê pakrewanên xwe li nav Mezelê Hecacan veşartin, li veşerê serî hilda û dest bi dirûşmeyên mîna; "Berxwedan jiyan e", "Bijî Kurdistan", "Bijî Serok Apo" kir. Pîrekan dilfîland, zarokan jî kevir davêtin zerîpoş û zîlan. Hêzên dewletê jî bi fişekên mîsogen gel gulebaran kir. Her çî xort û mirovên mezin bi nava Taxa Qışlê û Taxa Kanîkan de revîyan. Lê pîrek û zarokan li ber xwe didan. Yê li nav sûkê mayî jî derê dikanên xwe girtin û belav bûn. Li nav sûk û kolanên orîn û fikîna tanq û zerîpoşan bû. Zîlam û xortên kurd ên berguman (şûpheli) digirtin û binçav dikirin.

Xortekî bajarî (ereb) bi xwe ewle ku tiştêkî wî bi kurdayetiyê re nîn e,

dema pişeyê xwe ji dewletê re bibêje, tiştêkî pê nakin, hêdî hêdî bi hemdê xwe di kolanê re dimeşiya, ber bi mal ve diçû. Ji nişka ve zerîpoşa tîmên taybet li pişt wî rawestiya. Du tîm jê peya bûn û gotinê:

- Kuro tu bi ku ve diçî? Tu kî yî?
- Ez diçim malê, ez solcî (ayakkabî) me. (Dixwaze xwe bi pişeyê xwe, xwe bi wan bide nasîn, lewre solker giş ereb in, ne kurd in.)

- Ma bavê te çî kes e?
- Bavê min jî solcî ye.

- Kuro tu bavê te, hûn bi çî mijûl dibin û pişeyê we çî ye? (Tîm jî dixwazin ji pişeyê wî nîjada wî derxin; ka kurd e, yan ereb e.)

- Ez û bavê xwe solcîlikê dikin. Em solcî ne. Tim ji hev û din re dibêjin: "Em hê nikarin bi kurd û kurdayetiyê re bibin serî, îcar ev solcu ji me re derketin. De wî segbavî binçav bikin, bibin merkezê. Ev ji kurmancan bitalûketir e. Ji kalê xwe ve solcu, Miskof û komunîst e.

Berhevkar: BRO ÖMERÎ

Mêrikê xerzî

Çend zîlamên Xerzî diçin bajêr (Êlihê) ji bo ku ji xwe re hinek asusa bikin. Lê ewil dibêjin em ji xwe re hinekî li bajêr bigerin. Piştî ku hinekî ji xwe re digerin, dêhna xwe didinê ku hevalê wan Evdilkerîm wînda bûye. Evdilkerîm cara yekemîn e ku hatiye bajêr. Dereng jê haydar dibin ku hevalê wan wînda bûye. Li hev dipirsin: "Kuro ma kanî Evdilkerîm?" Ê din dibêje: "Ka Evdilkerîm?" Lê yek ji nîzane ew li ku maye. Ji hev re dibêjin: "Ku em wî nebînin, emê bihetikin, jixwe rebeno cara yekemîn e ku hatiye bajêr. Ku ne ji me re bûya, ne zanibû bê, ne jî dihat. Heta em wî nebînin, em tu kar û haziriyên xwe nakin."

Pir li Evdilkerîm digerin. Hemû bajêr li hev dixin, lê Evdilkerîm nabînin. Di dawiyê de ji hev re dibêjin, em bi ku re çûne, emê li şopa xwe veşerin. Gava ku di şopa xwe re vedigerin, tên dibî-

nin ku wa ye Evdilkerîm li îstasyonê li ber devê peronê sekiniye û çavên wî zoq li peronê ye. Nê li hevalên xwe ne jî li dora xwe dinihêre. Hevalên Evdilkerîm deng lê dikin, dibêjin: "Malik mîrato! Ev bû du saet em li te digerin. Tu bi ku de çûyî?" Evdilkerîm çavê xwe ji peronê qut nake û dibêje: "Ez bi cihekî de jî neçûm. Piştî ku min dît va li vir heşir (roja Mahşerê) rabûye, her kes sax bûye, ji binê erdê dertê, ez jî ji hinga ve li vir im. Min got, belkî rehmetiyê bavê min jî derkeve, bê ez wî bibînim. Lê heta niha jî nehatiye."

Nîşe: Ê ku Êlih (Batman) û Amed dîtibe dizane. Di îstasyonên van her du bajarên de jî peron hene. Girse di wan re derbasî alî bajêr dibe. Lê her du peron jî tim û tim bêronahî ne, devê wan wekî şikeft û hezazan reş dike. Mirov ditirsin ku di wan re derbas bibin.

Berhevkar: Q. DÊRSILAVÎ

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (126)

XAÇEPIRSA

Di wêneyê Beşîrê (Wêneyê)	H	A	Z	I	L	E	A	V	G	Û	N
Di wêneyê Navekî (Navekî)	N	A	S	A	L	A	T	E			
Di wêneyê Navekî (Navekî)	K	D	V	E	T	Q	T	Z			
Di wêneyê Navekî (Navekî)	Û	L	A	S	A	H	I	A			
Di wêneyê Navekî (Navekî)	F	A	S	A	N	A	R	I			
Di wêneyê Navekî (Navekî)	I	S	K	E	S	A	D				
Di wêneyê Navekî (Navekî)	E	N	I	R	I	N					

PEYVA VEŞARÎ

Mucadele Rêberkî neteweyî	Rade Jinxal	Kevan... Tîpa piştî D'yê	Dawera Argone Gup. hinarok	Kesê Ji Meraşê Navekî jinan	Temaşevan
		1		Bi farisî şev Werin	
Dem Heyf		Pêşengî Xwarina nîvro		2	
		Dawera Fîlorê Tîpa berî Syê	Dijberê mazûvan Amûrekî por		
Şoreş (bi soranî) Kelem			Not Kurê birayê mirov		
		Xwedê Elelok		Hacetê cotkirinê Sebir	
Nîşadîr Dawera Okstijênê			Pêşgirek Kurteniv isa bijîşk	4	
	Bi nav û deng Kuçik, seg				
Dawera Kukurtê Kanîn, şîyan		Bîrêz Tîpa piştî M'yê			3
			Berepaşkî notayek		

Bersiva Xaçepirsa 124'yan

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 126'an kasetê Aram 'Ax dilê' ye.

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsîn û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

AX DİLBERÊ

Ji ber ku xaçepirsa me ya hejmarê 124'an kasetê filmê Îsa Mesîh qezenc kirine: Cûneyt Botan/Wan, Songul Demir/Dîlok, A.Kadir Sincar/Îzmir, Süleyman Açıy/Mêrdîn, Mahmet Çağlayan/Semsür

Persbenoyê dewleta tirk demokrasî ra zaf dûrî yê Vardayînan de giştî dewlet esta

Nezdiyê vîst û panj rojî yo DGM ya Stenbolî, şan ra biryarê arêkerdina rojname dana û rojnameyo jî mecbûr maneno sansûrîn vejyeno. Şewa 20'ê pûşper de jî bombe çebiyê bûroyê Batmanî. Serdaranê rojnamî bombekirdin ser eşkerakerdin virast û vat bombekerdina bûroyê Batmanî de giştî dewlete esta.

Serdarê dewleta tirkê ke fekê xo akenê demokrasî, hiqûq û haqanê mardiman anê ziwane û nameyê demokrasî, hiqûq û haqanê mardiman kenê lîmin. Vardayînanê ewroyînan ra iyê jî vînenê ke, Tirkîye de nameyê demokrasîya, hiqûqîya û heqanê mardimanan qirş çiniyo. Ze ke yeno zanayînan, ê demokrasî, hiqûq û haqanê mardimanan qandê wayiranê karanê lîminan, kiştuxan û çeteyan anê ziwane. Jew nînan jî nêmanenê. Kesî ke teva pers kerd, a seat hetê mardimînan û demokrasîya çiqas qiseyê rindî estê, anê ziwane.

Zek yeno ke zanayînan Serokwezîrê Tirk Mesut Yilmazî serê na ser de Yilmazî vat: "Ezo sera 1998 sera demokrasî, hiqûq û haqanê mardimanan îlan kena. Nuwa tepya keso mevajo 'min îşkence dî', 'dewa mi, veşyê', 'lajê mi keyna mi binçim de kişyay û bî vîni'."

La belê bêrê bewnê ke, nîmeyê ser qediyê, yanê vatananê Mesut Yilmazî ser ra şes (6) mengî ravêrd, labelê Tirkîye, Tirkîye wa verîn a, dewê benê vengî (talî) mardimê binçim de kişyênê û benê vîni. Serdarê partiyan û komalanê demokratîyanê girotiyênê binçim û çebiyênê zîndanên. Bûroyê rojnameyo bombe beno, rojnameyan de ca dê niwîs û xeberan de "sansûrîn o" vejyeno. Radyoyê racyenê û zey nînan xeylê vardayîni viraziyay.

Dewlet nê kerdenê ke zerya kesî qelibînenê, nê dest rojanê peyinan de kerdî veşî. Nezdiyê vîst û vîst û panj rojiyo DGM ya Stenbolî ya niwîs û xeberanê rojnameyê ameyê Ülkede Gündemî ser, şan ra biryarê arêkerdina dana û polisê jî nê biryariya dest danê rojnameyê ser. Rojnameyo jî mecbûr maneno sansûrîn vejyeno. Wexto ke kes rojnameyê xo dest, zerya ci qelibiyena. Çimkî keso rojnameyê de ca dê niwîs û xeber de, "Niwîso ke tiya ca girotbi hetê DGM'ya Stenboliya



roy peyra, serdaranê rojnamî eşkerakerdin virast û vat bombekerdina bûroyê Batmanî de giştî dewlete esta.

21'ê meng de jî polisê Stenbolî şî Navenda Çanda Mezopotamya û seroka ci

ameyo sansûrkerdin" vînenê. Vîst û panj rojî yo rojnameyê Ülkede Gündemî wina vejyeno.

Vardayîni nînan nêmendî, şewa 20'ê na meng de bombeya destan çebiyê bûroyê rojnameyê Ülkede Gündemî de Batmanî: Bombebiyayîni bû-

Nuray Şen girot binçim badê çend saetan vet DGM û DGM îfadeyê ci girot û viradê.

Kiştî bînan ra dewleta tirk no hefte jî vardayîni xo Partiya Demokrasiya Şarî (HADEP) ser ro kemî nêkerdî. Mabenê 21 û 24'ê meng de Stenbol, Enqere, Aydın û İzmir de keyanê xeylê serok, serdar û endamanê parti rê û banê HADEP'a Aydın û Bağcılarê Stenbolî rê vardayîni virast; 66 serdar û endamê parti girotî binçim. Nînan ra serokê Enqerî Kemal Bülbül û Serokê Aydınî İbrahim Alçiçek û çehar serdarî çebiyay girotxanê û ê bîni wexto ke ma niwîs kerd hedre hewna binçim de bî. Vardayînan ser hetê Bûroyê Çapemeniyê HADEP eşkerakerdin viraziya.

Eşkerakerdin de vardayîni dewlet protesto kerdê û wina vajyawo: "Vardayîni ke HADEP rê virazyenê rojanê peyinan açaryayê zey kampanya. Êkê wadê demokrasî û azadîya amey karî ser û vat mayê dewlet çeteyan ra pak kim, dişmenê demokrasî û azadî vejyay. Vardayîni ke partiya ma, komalanê demokratîyanê rojnameyan rê virazyay nînan de înzaya înan esta". Nê vardayînan ra jî oyo ayseno ke Serokwezîr rê tirk Mesut Yilmazî nêşeno wayir rê vatananê xo vejyoy.

AZADIYA WELAT

Evîna Keça Agirî bo êgir

Tu gilokek ji êgir bûy ku ji agirê nava çiyayê Agirî hatibû xwarê; ji 21 adarê heta pûşperê.

Tu pireke jiyane bûy ji bawerî, biryardarî û aramê pêkhatî. Pireke berxwedanê ku ji Mazlûm xwe digihîne Zîlanê. Ramana te sergihayîkirina govenda nîvco ya mirov û êgir bû; şirkatiya evîna nîvco bû: Roj hat, di bihureke ku tê re bihurîn ne gengaz dihat dîtin, te bi hêza xwe ya dîrokî hemû bend û asteng dane ber xwe û li asîmanê Agirî tu gihîştî lûtkeya evîne.

Em di kesayetiya te hemû şehîden şoreşê bi rêz û hurmet bi bîr tînin.

**XEBATKARÊN KOVARÊN ÖZGÜR HALK,
ALTERNATİF, YAŞAMDA ÖZGÜR KADIN,
ÖZGÜRLEŞEN YURTSEVER GENÇLİK, JIYANA
REWŞEN, ZEND, ÖZGÜRLEŞEN EMEKÇİLER,
WEŞANXANEYA ARAM Û
ROJNAMEYA AZADIYA WELAT**



Sema Yüce

WELAT

ROJNAMEYA HEFTEYÎ (Haftalık Gazete)

- **Xwedî (İmtiyaz Sahibi)**
M. NURİ KARAKOYUN
- **Yönetim Yeri**
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308 Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212) 251 79 37-251 90 13
FAX: 251 95 85
- **Berpîrsê Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü)**
M. SALİH TAŞKESEN
- **ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
- **Yayın Koordinasyon:**
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
- **BELAVKIRIN BİRİYAY Dağıtım**
- **NÜNERİTİYEN ME (Temsilciliklerimiz)**
- **Mêrsin**
Tel: 0 (324) 233 83 96
- **İzmir**
Tel: 0 (232) 425 37 02
- **München: (Nünerê Giştî yê Ewropayê)**
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
- **Swîsre:**
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
- **Hollanda:**
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43
- **Suriye:**
Jana Seyda
Helim Yüsi

Di hunera destan a jinên kurd de daxwaziya welat û azadiyê i Bajarê Wanê berikçêkirin

Çawa ku xwendevan hînî xwendinê dibin, ew jî li ber destê dayik û dapîra xwe vî karî, vê çandê fêr dibin. Di heşt saliya xwe de jî dest davêjin çêkirina berikan. Belê ew bi vî karî çandekê diafirînin û ji aboriya mala xwe re dibin alîkar.

Di jiyana gelê kurd de berik çihê girîng digirin, keçên kurdan di çar saliya xwe de hînî tevî û teşiyê, çêkirina goreyên rîs dibin. Çawa ku xwendevan hînî xwendinê dibin, ew jî li ber destê dayik û dapîra xwe vî karî, vê çandê fêr dibin. Di heşt saliya xwe de jî dest davêjin çêkirina berikan. Belê ew bi vî karî çandekê diafirînin û ji aboriya mala xwe re dibin alîkar.

Nexşan diavêjin ser berikan, resmê cucikan, teyran, çêdikin, resmên gul û qelemokan (dikenotu) çêdikin.

Berikçêkera bi navê Fedîlê nexşên li ser berikan wiha rave dike: Gul, evîndarî ye; qelemek, ji hevqetî e; cucik û

Meta Kewê tu berikçêkerek î, ji kerema xwe re tu karî navên van berikan bibêjî û der heqê wan de tu çi di-zanî?

– Belê. Ez van hemûyan jî nas dikim û hemû jî min çêkirine. Şimik bûk, Sînanî, Canbêzar, Gulhezar, Şemari, Hewçêker, Çilgul, Lûleper, Herkî, Xalîbegî, Gulsara û Gulgeverin belê navê van ev in.

Çêkirina berikan ne tiştekî sivik e di zarokiyê de mirov dielime. Sebr û xebateke girîng divê. Berik boyaxeke eslî dixwaze. Ji ber vê yekê jî me boyax ji giha û qalîk (qaşil) fêkî çêdikir. Mînak:



kevok, xweşî û mizgînî ne. Xalên kesk sor û zer jî daxwaziya welat û azadiyê ne.

Di dîroka kurdan de berik çêkirin ji dema Ûrartûyan heya îro didome. Lê mixabin dewleta dagirker vî karî ji xwe re dike mal. Mînak, di namilkeyekê (broşûr) de ku ji aliyê dezgehên dewletê ve der heqê nasnameya Wanê de hatiye derxistin de tê gotin ev çand ji Asyaya Navîn hatiye, mîrateyeke Selçûkiyan e ji me re maye. Lê navê berika jî bi tirkî nanivîse (navên bi tirkî tune ne) bi kurdî dide çapkirin.

Mîna namilke nişanî Meta Kewê (70 salî ye) da, xwendin nedizani, ji Çolemêrgê koçberî Wanê bûbû, emrê xwe bi berikçêkirinê derbas kiribû. Meta Kewê hîn pirsên me wiha bersivandin:

Gihayê bi navê sendel û rûnas, qalîkê gûzê, qalîkê hinarê û qalîkê pîvazê.

Wekî berikan, me di dezgahên berikan de landikên zarokan, xurcîk, rişmê hespan û şalê ser şepikan jî çêdikirin.”

Meta Kewê, ku ji ciwantiya xwe de berikan çêdike, li ser berikan du çarîneyên gelêrî ji me re gotin.

Evîndar e evîndar e

Dilê rezîl evîndar e

Navê yara xwe nivîsî

Ser berika gulhezar e.

Binya malan gelî dâr e

Dilê şewitî zarezar e

Bejna yara xwe çêdikim

Li ser berika canbêzar e.

Ş. ELBAKÎ/WAN

Şimkubik (Kumikê şivan): Ji kulavên ku bi lêva berxikan ve tê çêkirin re dibêjin. Her wiha jî gava ku şivan diçin çolê û bi şev li derve li ber heywanan dimînin, ji bo ku serê wan serma neke kumik ku dikin serê xwe. Ji ber vê yekê ‘Kumikê şivan’ jî dibêjin.

Sine (Nexşê Xurîstanî): Dibêjin li Xurîstîn mirovên ku dijîn ne tenê kurd bûne, ecem, terekeme û hwd. ji ber vê yekê jî hunera wan bûye tevî hev û li dijî hevudu neçûne.

Gulhezar (Navê niha pêpisîk): Nexşê dara devê emeniyê ên piçûk dişibin lingên pisikan.

Şamari: Nexşê perik, gulên wê per vedane,

Şamari (Kostega saetan): Ev nexşeya han jî keç goreyên ku çêdikin zêdetir vê nexşê lédikin.

(Anadolu Derleme): Nexşên xalxalokên bi reng in. Ên mezin dayik in, ê piçûk jî zarok in.

Hewçêke (Qizilgul): Emenî yan jî doşimên erdê wan sor bin, di nav de rengên spî û rengên din hene lê heke rengên an jî gulên spî zêde bin jê re dibêjin qizilgul.

Çilgul (Çilbendik): Ev tevî wexta ku tê lidarxistin çil bendikan pê ve dikin û çil noqitkê de hene.

Lûleper: Ev jî nexşên golgolî ne li stûriyê beranan nihêrine e û nexşên wê derxistine.

Carcîma şivser (Herkî): Carcîm hem bi bevs, hem jî bi pijikê tê çêkirin.



Anadolu derleme: (Niha deveriya tê gotin)

Hafî Beg (Carcîma milkî): Mêrê jinikê ji jina xwe re gotiye: “Milkî milke, jin xurt e, erdê hilke.” Mana wê jî mîrikê hêze dide jina xwe, bila jinik zû çêke û lez bike, bibire û raxe.

Gulsarya (maçikê ‘nexşê’ Yusiv Begê): Di dema axa û began de Yusiv beg jî ji bo qonaxa xwe bixemilîne, çi nexşên bedew hene daye çêkirin.

Gulgever (Hişkeşin): Ev doşirme ji doşirmên din hişkîr tene çêkirin.

Çêkirina emeniyê: Berê hiriya berana a zivir

(sert) tê şuştin, dûre tê şêkirin, paşê bi teşiyê zirav zirav dirêsin û careke din bi teşiyê tê badan. Dû re ji risê ku hatiye badan telaşa (çile) çêdikin. Li gorî nexşê emenî, doşirme û carcîma tê boyaxkirin, ev boyaxkirin jî, bi boyaxa ku li sûkê tê firotin nîne, tenê bi koka hêşinahiyê û bi herîreşkê tê boyaxkirin. Piştî boyaxkirin, şuştin û suhakirinê tevî li dar dixin. Tevî jî bi pijik, bevs û kerkitê tê çêkirin.

Pijik: Şivikeke zirav û kin e. Gava bendê tevî li hev diwalin bi pijikê çep û rast lê didin û bendê tevî rast dibin.

Amadekar: YILDIZ GÜLTEKİN